Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1342 | 14-Çile-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Dayika ku bi dirûna bi tayên hiriyê debara xwe dike

Hêvî Keleş/ Qamişlo



**Emîra Hiso ya 62 salî jineke ku li hember şert û mercên dijwar, dirûtin û çêkirina cilên hirî ji xwe re kiriye çavkaniya hêz û aboriyê. Emîra Hiso anî ziman ku karê dirûnê palpişta wê ye, ew pê debara xwe dike û li hemberî zehmetiyên jiyanê li ber xwe dide.**

Emîra Hiso di sala 1961"an de li bajarê Qamişlo ji dayik bû. Çîroka vê jina şêst salî ku bi karê destên xwe rûmeta xwe dibarêze, wekî çîroka bi sedan jinan e ku bi bêdengî têdikoşin da ku rûmeta xwe biparêzin û debara xwe bikin. Girêdayê vê mijarê Emîra Hiso ji Rojnameya me re axivî.

Emîra Hiso ji me re behsa zarokatiya xwe kir û wiha got: "Di zaroktiya min de, dayika min her cûre cilên hirî ji bo me çêdikir da ku me ji sermaya zivistanê biparêze. Wê pêlîstok jî çêdikir û ez li cem wê rûdiniştim. Min ji vê pîşeyê hez dikir, ji ber vê yekê min di 11 saliya xwe de bi çêkirin û honandina pêlîstokên biçûk wekî destpêkek ji bo perwerdehiya xwe dest bi fêrbûna wê kir. Piştre min dest pê kir ku di karê xwe de hêdî hêdî pêş bikevim, heya ku ez bûm jinek ciwan û zewicîm. Piştî vê yekê, hevjînê min her gav piştgirî da min û min teşwîq kir ku ez di vê pîşeyê de berdewam bikim. Yek ji rêbazên wî yên teşwîqkirina min ew bû ku wî du makîneyên dirûnê yên hirî û cilan ji min re kirî da ku ez bikaribim karê xwe pêş bixim û bêtir hilberînim da ku perçeyan bifroşim û di wê demê de alîkariya wî bikim."

**' Hestek berxwedanê di dilê min de hat çandin'**



Emîra Hiso anî ziman ku piştî çend salan ji zewaca wê, hevjînê wê koça dawî kir û sê roj şûn de, her du kurên wê şehîd bûn, ew bi xemgîniyê hate dorpêçkirin, xemgîniya xwe wiha anî ziman û got: "Ji ber rastiya min a nû, bêhêvîtiyê hema hema min xeniqand. Hevjînê min her gav min teşwîq dikir û carinan di çêkirina cil û bergan de alîkariya min dikir û min kurên xwe winda kiribûn. Lê min ji xwe re digot ger ez dev ji xebatê berdim, ez ê nikaribim debara malbat û zarokên xwe bikim, ji ber ku kesek min tunebû ku piştgiriyê bide min. Min biryar da ku ez berdewam bikim û jiyan û xebata xwe bidomînim da ku ez ne hewceyî kesî bim û dema xwe ya vala bêyî ku li ser zehmetî û trajediyên jiyanê bifikirim tijî bikim. Min teşwîqek xurt girt da ku ez karê xwe bidomînim, ji ber vê yekê min dest bi hilberîna gelek cil û berg û aksesûaran kir, di nav de, girêdanên porê keçan, çenteyên mil, kenze, şal, lepikên zivistanê ez her tiştê ku kirrûbir ji min dixwaze çêdikim."

**'Hêvî dikim ku alîkariya jinên weke min bêne kirin'**

Emîra Hiso li axaftina xwe wiha zêde kir û got: "Demek hebû ku min ji bo pêşxistin û berfirehkirina karê xwe ji kesî piştgirî nestand. Ji ber vê yekê, ez hêvî dikim ku her kesê ku dikare piştgirîya min û hemî jinên di rewşa min de bike bi dabînkirina amûrên ji bo vê pîşeyê, wekî makîneyên dirûnê an derziyan, da ku em hunera xwe pêşve bibin û hilberên xwe pêşve bibin, ne tenê di vê pîşeyê de lê di her pîşeyê de ku jin tê de serketî ne, nemaze yên mîna min ên ku debara malbatên xwe dikin û berpirsiyariya lêçûnên malê û zarokên xwe hildigirin."

Emîra Hiso wiha dawî li axaftina xwe anî: "Jin di pêşketin û geşedana civakê de di hemû waran de roleke girîng dilîzin. Wan di gelek erkên ku wan girtine ser xwe û bi dest xistine de, çi ji hêla siyasî, leşkerî, çandî, an jî di hemû aliyên din ên jiyanê de, rola xwe nîşan dane. Jin tenê dixwazin ku ji hêla madî an exlaqî ve, heta bi awayekî biçûk jî, werin piştgirîkirin û wekî yên kêmtir neyên dîtin. Ez hêvî dikim ku rêveberiya me dê bêtir derfetên kar ji bo jinan biafirîne û deriyên berfirehtir ji bo pêşxistina jêhatîbûn û armancên wan, ku berê hatibûn tepeserkirin, veke, da ku ew karibin li pêşerojek geştir binêrin."

## FERHENGA BIWÊJAN

**Kefa destê min dixwere:**
- Wê pere bikevin desê min.

**Kurikan got em ê bikin keran, keçikan jî got qismetê me jî li Xwedê:**
- Em û şansê xwe; bila karê me jî bi hêviya Xwedê ve be; wê bi awayekî karê me jî pêk were.

**Pêgermokê digerîne:**
- Wisa xuya dike ku li benda tiştna ye; wisa xuya dike ku dixwaze tiştna bike; derdekî wî heye; beredayî naçe nayê.
(Dema yek destên xwe bi şûn xwe ve datîne ser hev, bi serê xwe hêdî hêdî diçe û tê wê demê tê gotin)

**Tajî jî dibêje ya Ellah, kêrvoşik jî dibêje ya Ellah:**
- Çawa ku yê dewlemend hêviya wî heye, yê xizan jî hêviya wî heye.

**Tu li benda miriyan bî tu yê ji nêza bimirî:**
- Kesên hêviya xwe bi tiştên bêwate ve girê didin ji bo wan tê gotin.

**Xefik vedaye:**
- Li benda qezencekê ye.

**Xort revîn keran, qîzan got; ya me jî ma li Xwedê:**
- Em û şansê xwe; bila karê me jî bi hêviya Xwedê ve be; wê bi awayekî karê me jî pêk were.

**Yê li ber avê diçe destê xwe diavêja şil û pilan:**
- Kesê bikeve zorê hêviya xwe bi tiştên bêwate ve jî girê dide.

**LI SER DERD Û KULAN**

**Bû kul ket dilê min:**
- Ji min re bû derd.

**Bû kul ma li ser dilê min:**
- Ji min re bû derd; ji min re bû hesret.

**Bûye kula li ser dilan/bûye kesera li ser dilan:**
- Bûye birîn; bûye derdê bêderman.

**Çavên min ziwa nebûn:**
- Ez ji derd û kulan xilas nebûm; bela li ser belayan hatin serê min.

**Çavên min naçin ser hev:**
- Derd û kulên min pir in.


**Çavên wê ji hêstiran ziwa nabin:**
- Her dem bi kul û derd e.

**Çiya kulên min hilnagirin:**
- Derd û kulên min pir in.

**Derd hatiye qirikê:**
- Derd û êşên wî pir in.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Hemza Sêvo




## Jina Kurd Li Helebê; Tevgera Azadiyê, Şoreşa Rojava û berxwedana şeş rojan



Ji Tevegra Azadiyê felsefeya xwe rakirin, ji Şoreşa Rojava hêza jina Kurd îsbat kirin û ji şerê çeteyên hikumeta demkî efsûneyên berxwedanê ku ji cîhanê re kirin mînak nivîsandin; Jina Kurd e, Jina Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ye.R-2

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1342 | 14-Çile-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# 'GUHERTINÊ LI SER HESABÊ XWÎNA GELÊ KURD PÊKTÎNIN'

Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê Ezher Ehmed destnîşan kir ku guhertina ku li Rojhilata Navîn û Sûriyê çêdibe li ser hesabê Kurdan e, dewleta Tirk jî sûdê ji tevlîheviya li Sûriyê û herêmê dibîne û hewil dide destkeftiyên Kurdan hilweşîne. Li Hemberî van polîtîkayan jî pêwîst e gelê Kurd li her derê zextekê li aliyên xwedî biryara siyasî bikin, divê her Kurdek li ku be, li kîjan welat û parçeyên Kurdistanê be, xwedî rêflêks û helwest be.R-6



## 'Serhildana li ser şopa Jin, Jiyan, Azadî vejîn bûye'



Rojnamevan Aso Bêkes diyar kir ku serhildanên li ser şopa Jin, Jiyan, Azadî vejîn bûye û çirûska wê ji bajarên Melek`şah, Îlam, Kirmanşah û bi gelemperî bajarên Rojhilatê Kurdistanê şewq daye û wiha got: "Wê guhertin di desthilatdariya Îranê de pêk bê, ji ber ku rejîma Îranê hem ji aliyê aborî û hem jî aliya siyasî ve têkçûye."R-3

## Sed birîndar û du Şehîd li Bakur Rojhilatê Sûriyê hatin pêşwazîkirin



Hevseroka Heyva Sor A Kurd Hediya Ebdullah da zanîn ku di nava hovîtiya êrişan de tîmên wan yên li her du taxan li ser erkên xwe bûn û got: "Hewildanên alîkariya tenduristiyê hatin redkirin, lê bi hatina birîndaran û Şehîdan re em li benda pêşwazî û pêşkêşkirina alîkariyê bûn. Nêzî sed birîndar û du şehîdan derbas bûn."R-7

## 'Êrişa li ser Rojava, êrişa li ser hemû Kurdên çar parçeyên Kurdistanê ye'




Rojnameger Mehmet Alî Ertaş û Rêvebera Federasyona Girtiyan Emîne Kaya diyar kirin ku çeteyên hikumeta demkî ku dewleta Tirk piştgiriyê dide wan, cureyeke din ên DAIŞ'ê ne ku van çeteyan hemû sûcên şer û li dijî mirovahiyê li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê pêk anîn...R-5

Bi qasî em rûmeta xwe biparêz in em ê baş bin — Nehîr Palê R-2


Qehremanên vî zemanî — Farûk Sakik R-4

Senaryoyên xwînmij li ser dikê berdewam dikin — Zekî Bedran R-4


Êrişa Şêxmeqsûd komploya navdewletî ye! — Dilyar Cizîrî R-6


Di civaka şareza de, polîtîka — Ehmed Hesen R-7

# Jina Kurd Li Helebê; Tevgera Azadiyê, Şoreşa Rojava û berxwedana şeş rojan

**Esma Mistefa**

Ji Tevegra Azadiyê felsefeya xwe rakirin, ji Şoreşa Rojava hêza jina Kurd îsbat kirin û ji şerê Hikumeta Demkî efsûneyên berxwedanê ku ji cîhanê re kirin mînak nivîsandin; Jina Kurd e, Jina Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ye.
Hatina HTŞ'ê ya ku xwe piştre weke hikumeta ragihandiye, ne ji bo dermankirina birînên 14 salan ya gelê Sûriyê hate ser serweriyê. Ev tenê berdewamiya pêkanîna pilanên navnetewî, berjewendiyên dewletên herêmî û perçekirina Sûriyê bû. Bi kêm gotinan ji bo avakirina dewleteke perçekirî û olperest bê avakirin bû.
Hikumeta demkî ya Sûriyê de 6'ê Çile de dest bi qirkirina gelê Kurd, Gelê Efrînê yên ku li her du taxên Eşrefiyê û Şêxmeqsûd jiyan dikirin, kir. Her du tax bi awayek hovane û bê wîjdanî hatin bombebarankirin. Hikumeta demkî ya Helebê bi hemû hêz, tang, çekên giran berê xwe da her du taxên Kurdan û bi çembereke ji çek û tangan dorpêçk kir. Di wir de bêwîjdaniya mirov û bê dengiya wan derket holê. Di wan her du taxan de jiyana gelekî ket ber vebijêrka qirkirinê, zarokê sê rojî ku dayîka wî hatiye birîndarkirin bê şîr bimîne, jiyana bi hezarên ji kal û pîran, ciwanan, jinan û zarokan bê sekinandin û rûbirûyê rûreşan, bên. Lê ev gelê ku xwe li hember van neyar û hovan dîtin, weke her carê ji caran biryara têkoşînê û berxwedanê ji çavên wan herikîn û bûn mertala têkbirina dagirkeriyê.
Di her du taxên Helebê yên Kurdan de ne tenê Kurdan lê jiyan dikirin. Ji dema avakirina xwesweriya xwe di dilê Rêjîma Baas de, her du tax bi sîstema xwe ya demokarsî û biratiya gelan, hemû pêkhate di wir de jiyan dikirin. Bi taybet ew malbat û kesên ku li hember Rêjîmê rabûbûn û qebûl nekiribûn, xwe di Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de bi cih kiribûn. Bi dehê salan e gelê Kurd, Ereb û hemû pêkhate û olên li wê derê jiyan dikin. Hewildanên Rêjîma Baas a têkbirin û teslîmiyeta vî gelê bi salan hate kirin, bi hemû rêbazên êriş, dorpêç û serdegirtinan ev yek hate kirin. Bi deh hezaran kes ji aliyê rêjîmê ve hatin girtin û îşkencekirin, lê di dawiyê de ev biryardarî bi tu awayî neket û têk neçû.

### Jina Kurd û felsefeya Rêber Apo di Helebê de

Ger em jin di Helebê de bi taybet di her du taxan de binirxînin. Divê em bi taybet jina Kurd bînin ser ziman.. Jina Kurd di wê taxê de çavê xwe li ser felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan vekir. Bi hatina Rêber Apo ji wî derê re bi hezaran jinê Kurd berê xwe dan Tevgera Azadiyê û di dilê rêjîma dewletê de jinan xebat meşandine. Em vê yekê weke ku em gotinan rêz bikin nabêjin. Di meşandina xebatê Cebhewî ya Tevgera Azadiyê ji salên 80'î û vir ve de, xebatê doza rizgariya Kurdistan û Tevgera Jina Azad li wê derê bi kêm derfetan hate meşandin. Di dilê rêjîma Esed de bi hezaran jinên Kurd xwe birêxistin kirin û di felsefeya Rêber apo de xwe xurt kirin.



Vê yekê bi demê re rewşa jin di her du taxan de guhert, cesareta ku jin di wê derê de bidestxistiye bandora xwe li ser xebatê giştî yê Teverê kir, tiştên ku bi destê hevalên mêr nedihat kirin, dayikên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dikirin. Bi van cesaretan ku di nava siyaseta dijmin de jiyan dikirin, di her du taxan de rihê welatparêziyê bi deh taq zêdetir bû û vê yekê bandora xwe li ser hemû jinên Efrîn û Kurd kir. Ji lewra bi derketina Şoreşa Buhara Gelan re û tepisandina wê di Sûriyê de, serîrakirinên destpêkê di wan her du taxên berxwedanê de hate kirin.

### Jin bi destpêkirina şer û avakirina xweseriyê de

Bi gurûpbûna agirê qaşo Şoreşa Sûriyê re ku dawiyê wa em niha dibînin çi bi dest xistiye re. Li her du taxan bi agirê dilê Sekîneyan, Seydoyan, Rifetan û Bêrîtanan, gel derket qadên berxwedanê. Êdî di wir de berhema felsefe, xebatê cebhewî, rêxistinbûna xwe ya feşartî derket holê. Zarokên ku di mal de bi destê dayikên welatparêz hatibûn mezinkirin, dem dema serîrakirina wan hatibû. Bi kirîza Sûriyê re û bi hemdemiya hilbijartina xeta sêyemîn ya Şoreşa Rojava ev gel daket qadan û rêjîma Esed red kir. Bi vejîna Şoreşa Rojava re, komên çeteyan, hêzên opozisyonê û hikumeta Sûriyê her kes li gor xwe ku çiqas qaşo li hember hev sekinî ne û ji bo rûxandina Rêjîma heyî ev kirîz derketiye holê; Lê li hember agirê Şoreşa Rojava ya ku di wê qadê de gur bûbû, hemû bi yek armancê ku em Şoreşa Gelê Kurd ango dengê gelê Kurd di vê Kawosê de vemrînin, êriş kirin.
Li ser wê esasê di sala 2011'an de bi hemû hêzên xwe şerekî man û nemanê li hember her du taxan dan meşandin, di wir de hêza jin û dayîka Kurd derket pêş. Li hember van êrişên dagirkeriyê û têkbirina îradeya gelê Kurd, Şerê Gelê Şoreşgerî û êradeya şervan û jinên Kurd di wir de hate derketin. Ji şehdata Dayê Gulê Selmo em qehremantiya jin û dayîkan li kêlek hêzên YPJ û YPG'ê dibînin. Bi sedan şervan û jinên Helebê li hember hovîtiya dijmin bûn mertal û şerê qadê ya singe sîng bi dijmin û komîn çeteyan re dan meşandin. Dayikan, mermî ji şervanan re tijî dikirin, xwerin çêdikirin û belav dikirin her wiha xebatê birêxistinkirina gel didan meşandin. Ev hevgirtin û lehengiya gel ji zarokan bigre heyanî kal û pîran, di bin yek navê de hat destnîşankirin; Ew jî Şerê Gelê Şoreşgerî bû ku çawa Rêber Apo pênasekiribû.
Bi rojan li hember wan her du taxan şerê man û nemanê hate meşandin. Li hember Rêjîma Esed, komên çekdar, hêzên opozisyonê, Eniya el Nûsra û DAIŞ'ê vî gelê têkoşîn kir û bi ser ket. Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hesab, dengeyên navneteweyî û pilanên wan yên ji bo gelê Kurd guhertin. Ji wir em îfadeya serkeftina bi Şerê Gelê Şoreşgerî derdixînin holê. ….
Di wir de kiryarên dijmirovî yên li ser jin û gelê Kurd hatin kirin, bi sedan jin û şervan hatin şehîdxistin, lê belê Berxwedana efsûnewî bi ser ket. Ji bo bidestxistina wê şerî, xwîn, zarok, ciwan û canê xwe danîn ser da ku dijmin neghîje armancên xwe. Ji lewra ew berxwedanî bi ser ket û Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bûn keleha serkeftinê.
Bi avakirina xweseriya xwe re her du tax bi Paradîgmeya Netewa Demokratîk xwebirêxistin kirin û saziyên xwe avakirin. Rêxistinbûna xwe, perwerdeyên dibistanan û jiyana civakî bi hemû ziman û pêkhateyên li wê der re bê cewisandina mafê tu gelî, dihate meşandin. Rêxistinbûnên jin li ser felsefeya azadiya jin ya Rêber Apo û ji lehengiya canfedayên ji bo serkeftina wan her du taxan, hatin birêxistinkirin. Li ser asta Sûriyê û derve xebatên bi heybet ya jin ji aliyê siyasî, civakî û dîplomasî hatin birêvebirin. Her wiha bi dagirkirina Herêma Efrînê di 2018'an de ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê û komên çeteyan ve, qismekî mezin ji gelê Efrînê ku zarokên her du taxan e, berê xwe dan wir û li wê derê jiyana xwe ji nû ve saz kirin.

### Ji jiyana bi ewle ber bi berxwedana şeş roj û dîrokek ji lehengiyê

Bi komployekê rêjîma Esed hate rûxandin û HTŞ'ê ango hikumeta demkî ya Sûriyê hate ser serweriya Sûriyê di 8'ê Kanûna 2024'an de. Hatina vê hikumetê kesayeta nû ya li ser cografiya Sûriyê ne kesayetekî nû bû, ji xwe di lîsteya terorê ya cîhanê de bû (Ehmed el Şeri) û di Sûriyê de bi salan di nava komên çeteyan de rêveberî kiriye. Piştî hatina wê ku çîrok û armanca wî jî ji yên Esed ne cudatir bû, dema gihîşt Parêzgeha Helebê berê xwe yekser da herêma Şehbayê û her du taxên Kurdan yên Helebê. Gelê Efrênê yên Şehbayê cara duyemîn bi darê zorê koçber bûn û her du tax jî ketin çembera HTŞ'ê. Piştî hewildanên vala yên ku xwestin bikevin taxê lê belê ev yek careke din bi îradeya gelê wê derê têk çû û piştre li ser bingeha hin peymanan weke 1'ê Nîsanê û 10'ê Adarê her du tax xwesertiya xwe parastin.
Beriya şerê man û nemanê y acara duyemên bi ser her du taxan de pêk were, tax ji aliyê hikumeta demkî ve ketibû dorpêçê û gelek caran komên çekdar hewil dan ku derbasî her du taxab bibin. di dema dorpêçê de jiyana gel, zarok û jinan bi her qawayî gelek zehmet bibû û di her kêliyê de raserastî berxwedan û têkoşîna li hember polîtîkayên birçîbûnê dihatin. Rûxmî tunebûna sotemenî û pêdivoyên civakê, tunebûna derman û şîrê zarokan, lê dîsa jî bi rihê berxwedan û têkoşîna 2011'an li ber xwe didan.
Bi êrişên di 6'ê Çile de hikumeta demkî da ku ev taxên biçûk werbigre, lihevkirin bi Îsraîlê re çêkirin, du bajarên Sûriyê firotin û lihevkirin û Tirkiyê re kirin ku Tirkiyê destekdarê yekemîn yê vê şerî bû, kir. Bi tangên dewletê, bi balafirên Beyriqdar ên Tirkiyê û bi komên çeteyên her du tax kirin armanc. Berxwedaniya lehengên Şervan û Fermandarên Kurd di wê derê de vê carê bi tîpên zêrîn hate nivîsandin. Bi riryardariya yan serkeftin yan jî Şehadet nêzî vê şerê bûn. rûxmî hemû hewildanên lihevkirin û avakirina aramiyekê di Sûriyê û Helebê de lê belê ev hikumet fem nekir û fem nekir, komên cîhadîst wê çi ji aştiyê û biratiya gelan fem bikin?
Ji lewra fermandarên keleha Dimdimê biryardariya xwe ya têkoşîn û berxwedanê heyanî Şehadetê dan. Em ê tu carî nikaribin bi van peyv û hevokan îradeya ku li wê derê derketiye bidin îfadekirin. Mixabin em ê nikaribin. Tehma berxwedaniya li wê derê û hovîtiya ku hatiye kirin, ancax kesên ku di wir de ev kêlî kêlî dîtine û jiyankirine rave bikin.
Komên çeteyan bi şerê xwe yê taybet û bi destekdayîna Tirkiyê û çapemeniya Tirkiyê hewil dan ku gel ji taxê derxînin. Rûxmî ku qismek ji wê gelê derket û li cihên cuda berbelav bû, piraniya wan jî hatin girtin, lê gelê berxwedêr di wir de li kêlek şervanên xwe ma. Bi soz û biryardariya Fermandarê Hemdem Ziyad Heleb û Denîz şervanan jî biryara berxwedanê dan.
Di nava hovîtiya vê carê de ku vê carê ne êrişên wan weke berê bûn û ne jî berxwedana me weke berê bû ku me biryara layiqderketina li berxwedana Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dabû. Ji lewra bi hezaran jin hatin Şehîdxistin û birêndar kirin. Li kêlek wê bi hezran jin ji aliyê komên çeteyan ve hatin girtin û kude birin kesek nizane. Şehîdên jin bi cenazeyên wan hatin lîskanidn û ji taqan de hatin avêtin. Gelo dîrok, cîhan û îslama wan wê çawa vê yekê ji bîr bike. Zarok di 6 rojan de bê xwerin û av mabûn, kesên ku derketin ku canê xwe xilan bikin jî piraniya wan jinan tev zarokên wan hatin girtin, her wiha weke di dîmen û fotoyan de hatiye derketin zarokên pênç û şeş salî bê dudilî kuştin. Jin li aliyekî di mizgeftan de girtin û mêr jî digirtin û dibirin. Gelo Çarenûsa van mirovan van jin û zarokan di nava Cîhadiyan de wê çi be? Di dawiyê de divê em ji bîr nekin li hember vê hovîtiyê tu rêxistin û saziyeke navnetewî dengê xwe nekir.

## Ji Pênûsa Jin

### Bi qasî em rûmeta xwe biparêz in em ê baş bin

**Nehîr Pale**

Têkoşîna rûmetê ya jina Kurd ev bûye 52 salan berdewam dike. Ji destpêka salên heftî dest bi têkoşînê kirin û berdewam dikin. Çanda berxwedanê ya Jinên Dêrsimî, Zerîfa Koçgirî, Leyla Qasim, Bêrîtan Hêvî (Gulnaz Karataş), jinên Şengalê, Rêwan Kobanê, Avesta Xabûr û heyanî roja îro çileya 2026`an berdewam kir. Jinên Kurd li ber xwe didin, radest nabin û ji bo nekevin destê dijminê xwe jiyana xwe feda dikin. Ew têkoşîna rûmetê li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê jî hat meşandin.
Roja 3`ê Cotmehê sala 2013`an Şehîd Roksan Xelîl (Eyşe Ibrahîm) li hemberî çeteyên Cebhet El-Nusra li navçeya Cindirêsê ya Efrînê heyanî guleya xwe ya dawiyê li ber xwe da û ji bo nekeve destê çeteyan de çalakiya fedayî kir. Ew jî keçeke delal a gundê Kaxrê yê navçeya Mabata ya Efrînê ye. Jinên Efrînê ne cara yekeme ku li hemberî çeteyên Cebhet El-Nusra li ber xwe dane û çalakiyên fedayî kirine.
Bila kesek li ser şervanên jin ên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê negrî û axîn nekşîne, ji ber wan têkoşîna rûmetê dikir. Xwedî li çanda berxwedanê ya jinên Kurd derketin. Çawa şehîd Roksan Xelîl li hemberî çeteyê Cebhet El-Nusra serê xwe netewand û çalakiya fedayî kir, li Şêx Meqsûd û Eşrefiyê jî keçên Kurd li dijî heman çeteyan li ber xwe dan û bi rûmet şehîd bûn.
Têkoşîna rûmetê ya Jinên Kurd li hemberî zîhniyeta mêr ya desthilatdariyê tê meşandin. Ji bo jin serê xwe netewînin, radest nebin, lewaz nekevin fêr bibin li ber xwe bidin û rûmeta xwe biparêzin bi sedan jinên Kurd canê xwe feda kirin.
Jinên Kurd di şoreşa Rojava de li dijberî dewleta Tirk a dagirker, çeteyên DAIŞ, Cebhet El-Nusra, çeteyên girêdayî Tirkiyê serî netewandin û heyanî guleya xwe ya dawiyê şer kirin û şehîd bûn.
Ji ber vê yekê em ê li beramberî jinên têkoşer ên serî netewandin û rûmeta xwe parastin bejna xwe bitewînin û rêça wan bişopîn in. Civaka zayendperest jin fêrî koletiyê kiribûn û êdî koletî ji jinan re bibû adet, serê xwe ditewandin, bêdeng diman û radestî mêr dibûn. Jinên Kurd ji bo van adetan bişkîn in destbi şoreşê kirin. Di têkoşîna xwe ya li hemberî dewleta Tirk a dagirker û çeteyên barbar de van adetan bi bedelên mezin dişkîn in. Êdî jinên Kurd fêrî çanda berxwedanê û têkoşîna leşkerî, siyasî û îdeolojîk bûne. Di şoreşa Rojava de silogana JIN, JIYAN, AZADÎ kirin çand û niha li tevayî cîhanê belav bûye.
Di çalakiya bendava Tişrînê ya ku 8`ê Çileya 2025`an destpêkirî gotin:`Bila mirin ji me bitirse` ev jî di têkoşîna jinên Kurd a Şêx Meqsûd de bû çand.
Rûmet parastin bi bedelên mezin tê parastin, lê belê rûmet wê jinê ji qeydên koletiyê rizgar bike. Bila kesek berxwedana jinên Kurd a li Şêx Meqsûd û Eşrefiyê bi girî û dilşewatî pêşwazî neke. Jinên canê xwe feda kirin ne ji bo em bigrîn û dilê xwe bişewtînin li ber xwe dan. Ew ji hemû jinên Kurd dixwazin ku soz bidin çanda berxwedanê berdewam bikin, rêça wan bişopînin û rûmeta hemû jinan biparêz in.



# Bi hinceta Ewlehiya Netewî Trump dixwaze Girînlandê desteser bike

IsraraTrump li ser tevlîkirina gireva Girînlanda Danîmarkayê bo xakên Emarîkayê, gelek pirsan li ser giringiya vê girevê ya istratîjîk dixe rojevê de.

**Jîn Hisên**

Ji ber ku meseleya Girînland vedigere ser mijara nîqaşên jeopolîtîk, li paytextên Ewropî fikar zêde dibin, Serokê Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê Donald Trump israr dike ku fikra kontrolkirina girava Arktîkê bîne ziman, ji daxuyaniyên sade wêdetir diçe ceribandinek rastîn a hêza hevpeymaniyên Rojavayî û şiyana wan a birêvebirina nakokiyan di nav hevpeymaniya Atlantîk de. Serokê dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê diyar dike ku tevlîkirina Girînlandê ji bo parastina ewlehiya wê ya netewî pêwîste, ev yek bi awayekî dûbare aniye ziman, di heman dema operasyona leşkerî ya Emerîkayê li Venezuelayê, ku di encamê de serokê Venezuelayê Nicolas Maduro û hevjina wî hatin girtin. Danîmarkayê jî daxuyaniyê Trump red dike, serokwezîra Danîmarkayê Mette Fredericksen daxwaz ji serokê Emarîkayê kir ku êdî dest ji gefan berde, tekez dike ku Washngtonê tu mafê wê tune ye ku girevê tevlî xaka Emarîkayê bike û ne ber frotinê ye, herwiha destnîşan kir ku kontrolkirina Emarîkayê li ser girevê wê NATO'yê bi dawî bibe. Di navbera israkirina Emerîkayê û redkirina Danîmarkayê, gelek pirsên li ser qîmeta îstratîjîk ya vê girevê tê pejirandin û serdem israra Trump a li ser tevlîkirina wê.

### Ewlekariya neteweyî

Girînland yek ji mezintirîn giverên di cîhanê de ye, ew herêmeke rêveberiya xwe bi xwe dike û girêdayî Danîmarkayê ye ji 600 salî ve, hejmara şêniyên wê nêzî 57 hezar e, bergeheke leşkerî ya Emerîkî di nava xwe de dihewîne. Girav li cihekî stratejîk ê bêhempa di nav Çembera Arktîkê de ye, li ser xaçerêya Dewletên Yekbûyî, Rûsya û Ewropayê, ev yek jî girîngiyeke jeopolîtîk a mezin dide wê ku ji 150 salan zêdetir e bala Washingtonê dikişîne. Girîngiya jeopolîtîk a vê giravê bi vebûna wê ya ber bi Arktîkê û rêyên keştîvanî û bazirganiyê ve zêde bû.
Di dema yekem a serokatiya Trump pêşniyara kirîna giravê kir û vê dawiyê feydeyên vê gavê ji bo ewlehiya neteweyî ya Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê li hember Rûsya û Çînê dubare kir.

### Çavkaniyên xwezayî

Ji bilî cihê xwe yê stratejîk, Grînland xwedî dewlemendê çavkaniyên xwezayî ye, di nav de mîneralên bê hempa ên ku di çêkirina ragihandinê de têne bikar anîn, li gel uranyûm, zeviyên petrolê yên berfireh û rûberên mezin ên zeviyên gaza xwezayî ya nehatî bikaranîn.
Xuya ye ku girêdayîbûna Washingtonê bi Pekînê re ji bo madenên bê hempa ên erdê sedema wê ye ku Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê ber bi lêgerîna çavkaniyên alternatîf ên ku ji hêla erdnîgarî ve nêzîktir û ewletir in ve dibe.
Daxuyaniyên dawî eşkere dikin ku ev mijar di nav Yekîtiya Ewropî û NATO'yê de veguheriye astengiyeke berfirehtir, ku tê de hesabên hevgirtinê bi Danîmarkayê re, nirxandinên qanûnî û pêwîstiya domandina piştgiriya Emerîkî li ser mijarên hesastir, di serî de şerê li Ukraynayê û hevsengiyên hêza cîhanî, bi hev ve girêdayî ne. Ev pirsgirêk guhertinek kûrtir di xwezaya siyaseta Emerîkî de li hember erdnîgariya stratejîk û çavkaniyên girîng nîşan dide, di demekê de ku nexşeyên desthilatdariyê li Arktîkê ji nû ve têne xêzkirin, di nav pêşbaziyek germ a di navbera hêzên mezin de, ku Ewropayê dixe ezmûneke dijwar de di navbera parastina prensîbên serwerî û serxwebûnê û xweguncandina bi rastiyek navneteweyî re ku ber bi hişkbûn û şikandina şert û mercan ve diçe.
Di vê mijarê de, raporek di Financial Times de destnîşan dike ku: Serokên Ewropî bi mehan e ku bi wê yekê mijûl in ku çawa bersiva daxwaza bêaqil a Serokê Emerîkayê Donald Trump a ji bo desteserkirina Girînland bidin, lê di rojên dawî de tevlihevî û fikarên wan zêde bûne.
Israra dubare ya Trump li ser wê yekê ku Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê kontrola Girînland ji hevalbenda xwe ya nêzîk Danîmarkayê bistîne, kaosa di navbera paytextên YE û NATO'yê de li ser ka çawa li ser mijarên din ên jeopolîtîk bersivê bide Emerîkayê, di nav de êrişa Emerîkayê ya li ser Venezuelayê û nêzîkatiya wê ya nakok a li hember dagirkirina berfireh a Ukraynayê ji aliyê Rûsyayê ve zêde kiriye.
Berpirseke payebilind ê Ewropî got: "Ew xêzek zirav e... Hevgirtina bi Danîmarkayê re ji bo her kesî bi tevahî eşkere ye. Lê Venezuela heye, ku kes ji ber çûyîna Nicolas Maduro poşman nabe, lê pirsgirêkên qanûnî hene. Em dixwazin piştgiriya Emerîkayê bidomînin da ku li Ukraynayê encamek bi rûmet bi dest bixin.
Berpirseke din ê YE'yê got, "Em dizanin kî êdî nema hevalbendê me ne... lê em hîn jî hêvî dikin ku em xelet in û pirsgirêk dê bi xwe çareser bibe." Bi îşaret paşguhkirina Trump ji hevpeymaniya demdirêj a transatlantîk û pêwîstiya kêmkirina girêdayîbûna xwe ya bi Washingtonê re ji Ewropayê re kir.
Piştgiriya Danîmarka û Girînland ji cîranên wan ên welatên bakur û Baltîk bi lez hat, piştre welatên din ên wekî Fransa, Almanya û Keyaniya Yekbûyî jî hatin. Lêbelê, hindik kesan bi eşkereyî Dewletên Yekbûyî şermezar kirin, û kesî navê Trump negot, her çend serokê Dewletên Yekbûyî tenê çend demjimêran piştî ku Serokwezîra Danîmarkayê Mette Frederiksen jê xwest ku dev ji gefên li ser girava Arktîkê ya mezin berde, îdiaya xwe ya "em hewceyî Girînland ne" dubare kir. Serokwezîrê Swêdê got, "Tenê Danîmarka û Grînland xwedî mafê biryardanê li ser mijarên têkildarî wan in". Sir Keir Starmer, serokwezîrê Brîtanyayê herwiha got ku ew ê li dijî gefên Trump ên ji bo tevlîkirina Girînland li kêleka Danîmarkayê raweste, ji ber ku ew bi zexta dijberên xwe yên siyasî û endamên parlamentoyê re rû bi rû ye ku li dijî Koşka Spî rawestin.

### Girîngiya jeopolîtîk a Girînland

Gronland ne giravek dûr û cemidî ye, lê navendeke stratejîk a bi temamî ye, ku cihekî erdnîgarî yê hesas e, çavkaniyên xwezayî, ewlehiya neteweyî û pêşeroja teknolojîk bi hev re dike yek.
Giringiya jeopolîtîk a Girînland berî her tiştî ji cihê wê yê li navenda korîdorên qutbî tê, ku tê payîn ku di du dehsalên bê de dema ku qeşa dihele wê bibe rêyên sereke yên bazirganiya cîhanî. Kontrolkirina wan dê desthilatek mutleq bide çavdêrîkirin û kontrolkirina rêyên deryayî yên ku dikarin bi Kanala Siwês û Panamayê re reqabet bikin. Di heman demê de nexşeya aboriya navneteweyî bi awayekî mezin biguherînin.
Girînland astengiyeke ewlehiyê ya pêşketî li dijî berfirehbûna bilez a Rûsyayê li Arktîkê bi rêya baregehên leşkerî û sazkirinên radarê, herwiha li dijî daxwazên zêde ya Çînê li herêmê bi rêya veberhênan û lêkolînên zanistî; temsîl dike, tevî ku Pekîn xwe wekî "welatekî nêzîkî qutbê" bi nav dike, ev wesfek ku daxwazeke stratejîk a rastîn nîşan dide.

### Çima Trump Girînland dixwaze?

Di bin sernavê "Çima Trump Girînland Dixwaze?" de, nûçeyek New York Times destnîşan dike ku:
Trump dibêje ku girav ji bo ewlehiya neteweyî ya Emerîkayê giring e û Danîmarka ji bo parastina wê zêde xerc nake.
Girînland ji ber cihê xwe yê jeostratejîk xwedî giringiyeke mezin e. Di Giravê de baregeheke leşkerî ya Emerîkî ya pispor di parastina mûşekan de heye. Piraniya Girînlandê di nav Çembera Arktîkê de ye, ku hêzên mezin ji bo serdestiya leşkerî û bazirganî li wir pêşbaziyê dikin. Kontrolkirina giravê dê cihek stratejîk bide Washingtonê di korîdorek deryayî ya girîng de ku Okyanûsa Atlantîk bi Arktîkê ve girêdide, ku guherîna avhewayê qeşa dihelîne û herêmek ku berê ne gengaz bû vediguherîne qadeke pêşbaziyê.
Girînland herwiha xwediyê rezervên mezin ên medenê erdê yên bê hempa ye ku di çêkirina batariyan, telefonên desta, wesayîtên elektrîkê û hilberên din ên teknolojiya bilind de têne bikar anîn. Niha Çîn li bazara cîhanî ya van medenan, serdest e.
Hin zanyar dibêjin ku dibe ku hin beşên refê parzemînî yê Girînland çavkaniyên mezin ên petrol û gazê hebin. Lê hikumeta Girînland di sala 2021'an de, ji ber xetereyên jîngehê û nebûna gengaziya bazirganî, dev ji armancên xwe yên petrolê berda.




### Trump bi israr e ku dest deyne li ser Girînland

Serokê Emerîkayê Donald Trump roja Înê di 9'ê Çile de niyeta xwe ya ji bo gihaştina rêkeftinekê bi Danîmarkayê re ji bo kirîna Girînland piştrast kir û tekez kir ku Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê dê "bi nermî an bi şîdetê" wê bigihêjin armanca xwe, tevî ku bi awayekî dubare Kopenhagenê dibêje axa Arktîkê ne ji bo firotanê ye.
Trump israra xwe ya li ser bidestxistina Girînland ji aliyê Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê ve dubare kir û îdia kir ku ev yek ji bo parastina ewlehiya Emerîkayê ji gefên muhtemel ên ji Çîn û Rûsyayê pêwîst e û dibêje: "Em nikarin rê bidin Rûsya an Çînê ku Girînland dagir bikin. Ger em vê yekê nekin, ew ê wisa bikin."
Operasyona ku hêzên Emerîkî li Caracas ji bo girtina Serok Nicolas Maduro û hevjîna wî di hefteya borî de pêk anîn, cîhan di rewşek şokê de hişt û tirsên Danîmarka û Girînland ku herêmeke xweser e di bin serweriya Danîmarkayê û beşek ji NATO'yê de ye, zêde kir.

# ‘Kiryarên li Şêxmeqsûd pêk hatin qirkirina etnîkî ye’

Sekreterê Giştî yê Partiya Sûriya Demokratîk Reca Cemîl Damisqî tekez kir ku kiryarên li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê pêk hatin dighêjin asta sûcên şer û got, “Ev kiryar bi awayekî zelal xuyanî dike ku qirkirina etnîkî pêk tînin, divê kesên ku ev sûc pêk anîn bên muhasebekirin li pêşiya dadgeheke adil."

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Di 6’ê Çile de çeteyên girêdayî hikumeta dmikî ya Şamê ku bi awayekî rasterast ji hêla dewleta Tirk ve tê piştgîrkirin, êrişeke xwînî û hovane li dijî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê pêk anîn ku piraniya wan ji gelê kurd in. Li hember van êrişan berxwedniyeke dîrokî û efsane hat kirin ji hêla Hêzên Ewlekariya Hundirî (Asayîş) û gelê berxwedêr ku şerkî xweparastinê bi çekên herî sivik, îardeyeke xurt û biryara mirin an serkeftinê li dijî hêzeke mezin a ku bi çekên giran tax dihatin bombebarankirin, dan meşandin.

Gelek sivîl bi taybet zarok, jin û kesên bi temen mezin di encama topbaran bi çekên giran ji hêla çeteyan bi giranî birîndar bûn, herwiha hejamreke sivlî şehîd ketin, di heman demê de hejmareke mezin ji şêniyan çarenûsa wan ne diyar e piştî ku çeteyên hikumeta demikî ya Şamê dest danî ser taxan.

Bi berdewamiya pêkanîna binpêkirin û sûcên dijmirovî ku çeteyên hikumeta demikî ya Şamê li peravê û Siwêdayî pêk anîn, heman kiryar li dijî gelê kurd pêk anî, di nava bêdengiyeke raghandinî ku gelek sûcên li taxa Şêxmeqasûd hat kirin û hîn jî berdewam e, tên veşartin li pêşiya raya giştî.

Li gorî hin dîmenên ku hatin eşkerekirin kiryarên ku aqilê mirov tehûml nake li ser destên van çeteyan hatin kirin, ji kuştina meydanî, şewitanidina laşê şervanan, endameke jin a Asayîşê ku li berxweda heta gihaşt asta şehadetê çeteyan laşê wê ji qata duyem a avahiyekê avêtin xwarê, bêyî tu rêzgirtin û hurmet ji miriyan bêne kirin, di heman demê de kuştina ciwanekî û derxistin çav û dilê wî li hember kamîreyê û parvekirina wê li ser medyaya civakî û ji xeynî van binpêkirinên ku nayên parvekirin.

Piştî ku çeteyên girêdayî hikumeta demikî ya Şamê dest danîn li ser taxan, rasterast dest bi girtina şêniyan kir çi jin, mêr, zarok û kesên bi temen mezin kirin, ku heqaretên devkî tê de hin kes bi zanebûn sivîlan bi zimanekî neexlaq û nijadperest biçûk dixin, wan wekî “beraz”, “kûçik” û “Qendîliyan” bi nav dikin, ku bi awayekî vekirî Kurdan hedef digirin.

Ew tiştê ku diqewime ne bûyerên ferdî ne, lê binpêkirinên sîstematîk in ku wêneyek mirovî ya pir hovane li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê nîşan didin, di nava bêdengiyeke bi şerm ji aliyê civak û raya giştî ya navdewletî, ku tê wateya hevkariya li hember tawanên ku di ronahiya rojê de li dijî sivîlên bêparastin têne kirin.

Derbarê van kiryaran Sekretêrê giştî yê Partiya Hevgirtina Sûriya Demokratîk Reca Cemîl Damisqî ji rojnameya me re axivî.

### ‘Kiryarên li Şêxmeqsûd pêk hat di asta sûvên şer de’

Sekretêrê giştî yê Partiya Hevgirtina Sûriya Demokratîk Reca Cemîl Damisqî diyar kir ku tê xuyanîkirin tiştê hikumeta demikî ya Şamê û çeteyên girêdayî wê pêk tîne, ji hêla hêzên derve têne kirin û birêve birin û wiha got: “Ji ber ku gelê Sûriyê ne mirovên xwînmij, tundraw û kujerin, êrişên ku têne kirin ji hêla çeteyên tundraw ku ji tevajî cîhanê li Sûriyê kom bûne, hemû gelê Sûriyê hedef digre. Kiryarên ku li Şêxmeqsûd pêkhat wekî şewitandin, avêtina laşê şervanan û kuştina meydanî ji bilî kiryarên din yên mirovî dighêje asta sûcên şer, divê civaka navdewletî erka xwe bi cih bîne û daxwaza muhasebekirina kujeran û kesên ku ev binpêkirin pêk anîn e bike di heman demê de pêşkêşî edaletê bên kirin wekî kujerên şer.”

### ‘Bi zelalî qirkirina gelan pêk tînin’

Reca Cemîl Damisqî kiryarên ku li peravê li ser elewiyan, xirstiyanan û li Siwêdayê li ser Durziyan wekî qirkina entîkî bi nav kir û wiha got: “Bi dawîkirina gelan li gorî mezheb an netewê wê ji bo berjewendiyên van hêzên tundraw yên ketine Sûriyê de, têne kirin. Her kes dizane ku Tirkiyê



van çeteyên tundraw bikar tîne, di riya van kiryar û sûcan bi awayekî zilal xuyanî dike ku qirkirina gelan e çi elewî, duzrî, kurdî an xirstiyan bin, kiryarên ku pêk tînin kuştina exlaq, nirx, hebûn û mirovahiyê ye. Divê kiryar, binpêkirin û sûcên şer bêne belgekirin, ji bo hemû rêxistinên navdewletî û hiqûqî bêne şandin, bi tayabt ji bo Netewên Yekbûyî, ku ji hêla wan ve jî ev sûc bêne belgekirin da ku binpêkirin bêne bidawî kirin. Di heman demê de divê lêpirsînek bê vekin derbarê van kujerên ku binpêkirin pêk anîne û pêkêşî dadgehekê bikin û bi awayekî hiqûqî û adil bên muhasebekirin.”

### ‘Em nikarin garantiya wan bawer bikin’

Reca Cemîl Damisqî diyar kir ku em nikarin tu garantiyan bawer bikin li gel van tundrawan, dibe ku sûc û binpêkirinên ku kirin dîsa dubare bikin û wiha anî ziman: “Ev kiryarên ku dighêjin asta qirkirina entîkî û windakirina hebûnê, ne ji mafê wan e ku hebûna tu kesî winda bike, em nikarin garantiya wan bawer bikin. Divê bi hemû awayan em li hember wan bisekinin çi di aliyê leşkerî, siyasî û mirovahî de be, di heman demê de hewil bidin ku hemû sûcên ku pêk anîne û rastiya wan derxin eşkere bikin ji cîhanê re, ku çawa pabendî bi tu qanûn, şeriyeta dewletê, pernesîbên exlaqaî û olî nabin.”

Sekretêrê giştî yê Partiya Hevgirtina Sûriya Demokratîk Reca Cemîl Damisqî wiha gotina xwr qedand: “Em civaka navdewletî berpirsyar dikin derbarê bûyerên ku çêbûn, ji ber bêdengiya wan a li ser van sûcan û ne derxistina tu biryaran an tedbîran li ser rastiya erdê da ku nehêlin ev kiryar pêk bên. Lê civaka navdewletî her dem li gorî berjewendiyên xwe kar dike. Em daxwaz ji civaka navdewletî û rêxistinên hiqûqî yên navdewletî dikin ku erk û berpirsyartiya xwe pêk bîne di parastina pêkhateyan de li hember tundrawiyê, eger ev hêzên tundraw çalak bibin û hêza wan xurt bibe, dê ev zirar bighêje herêmên wan jî û tiştê ku em pê re derbas bûn, heman bûyer bi wan re jî derbas bibe. Divê civaka navdewleî tavilê bikeve nava tevgerê, di heman demê de Netewên Yekbûyî û hemû rêxistinên mirovî û hiqûqî biryarên xwe bidin ku li hember vê tundrawiyê bisekinin.”

# Fermandarê berxwedana Şêxmeqsûd; Ziyad Heleb

**Gulîstan Xalid**

Wateya êşê di jiyana Gelê Kurd de bûye têkoşîn, berxwedanî û qehremanî. Jiber rengê êşê bi xwe di civaka me de naşibe rengê êşa tu civakan. Civakeke ku jiber nasnameya xwe, çanda xwe û bi giştî hebûna xwe bi her cûreyên êrîşên qirkirinê re rû bi rûye. Dema ku rengê êşê ev be, wateya wê jî dibe tişteke din. Ji bo parastina hebûna xwe û xwedî li nasnameya xwe derkeve ji derveyî berxwedanî û têkoşîneke qehremanî ji xwe re bijartekeke cûda nas nake. Rengê êşa civaka me dibe helwesta azadiyê.

Vaye dîsa me li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dît, em dîsa bûne şahidê dîmenên ku bi caran me di dîroka xwe de dît. Li aliyek êrîşkarên hovane, li aliyek berxwedêrên bi vîneke ku bi tu gotinên xweşik nikare were pênase kirin. Tenê cih û dem dughere, lê wêne bi rengên herî xweşik û nexweşik careke din hate ber çavên me.

Ez naxwazim wêneyên nexweşik dûbare bidim rêz kirin, her çendî dizanim ku ewê di bîra me de her zindî bimîne, lê ji bo çend kêliyan be jî zêdetir dixwazim wêneyên xweşik bibîr bixim. Yek jê jî wêneya sekna fermandarê leheng ku beriya şehîd bibe qal bikim. Fermandarê ku bê tu nas bike di rûyê wî de hemû taybetmendiyên mirovatiya xweşik xwe bi te dida hîs kirin. Hevaltî, dilnizmî, kedkarî, fedekarî, durustî, paqijî, jidilî, wêrekî, hazkirina xakê, hezkirina mirovan, evîndariya azadiyê, lehengî . îja ev taybetmendiyên di rû de xwe bi awayeke şênber jî nîşan da, di şêwazê têkiliyên fermandar Ziyad Heleb bi hawirdora wî û di çalakiya ku li hember êrîşkaran de jî pêkanî teqez bû.

Gotina ku her şerek li fermandarê xwe digere, di kesayeta heval Ziyad de fermandarê ku ji bo welateke azad û jiyaneke azad ji şer re pêşengtiyê dike, şer dike û dide şer kirin, li berxwe dide û hawirdora xwe diparêze û dide parastin, rastiya fermandarê ku bi xwe şervanên xwe ava dike û li fermandaran nade gerandin da nîşandan.

Di vî şerî de elbette gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê li gel şervanên xwe bi giştî berxwedaniyeke bê hempa nîşandan û sekneke têkoşer raber kirin. Her keseke ku di vê pêvajoya şer de li wir bûye, xwedî destaneke ya berxwedaniyê ye. Hêjaye ku ev pir bê vegotin. Çi di warê tehlîlkirin û şîrovekirinan de be çi jî di warê wêjekirinê de em gereke ji zarokên pêşerojê re jî raghînin. Em gereke ji dîroka xwe ya ku dixwazin bidine jibîrkirin neqiş bikin.

Ji wan destanan jî heval Ziyad Helep ewê her û her di nava nifşan de bê gerandin. Vaye li kobanê bi hezaran gel pêşwaziya vî fermandarê nemir dikin. Di walatê me de îja ne tenê wateya êşê guherî, wetaya evîndariyê jî guheriye. Bi hezaran mirov, heya bi milyonan jî dibine evîndarê vî mirovê xweşik. Jiber bi rastî careke din di kesayeta heval Ziyad de hate nîşandan ku mirovên têkoşer xweşikin, yê xweşik jî jiber ku azad dibin têne hezkirin.

Bera çavên te rehet razê fermandarê me, vaye bi hezaran deng dibine yek deng û yek soz û yek armanc. Bi hezaran dibêjin “ ya jiyaneke azad yan jî mirineke bi rûmet, ji bo jiyaneke azad hêjaye ku mirov canê xwe bibexşîne”. Helwesta ku te raber kir dûbare bû soza gelekî.



# ‘Serhildana li ser şopa Jin, Jiyan, Azadî vejîn bûye’

Rojnamevan Aso Bêkes diyar kir ku serhildanên li ser şopa Jin, Jiyan, Azadî vejîn bûye û çirûska wê ji bajarên Melek`şah, Îlam, Kirmanşah û bi gelemperî bajarên Rojhilatê Kurdistanê şewq daye û wiha got: “Wê guhertin di desthilatdariya Îranê de pêk bê, ji ber ku rejîma Îranê hem ji aliyê aborî û hem jî aliya siyasî ve têkçûye."

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Xwepêşandanên ku ji 28`ê kanûna 2025`an ve li seranserî Îran û Rojhilatê Kurdistanê didomin. Li gorî agahiyên ku hatine belavkirin ku di roja 14`mîn a xwepêşandanan de, hêzên rejîmê bi şêwazek tûnd êrişî ser xwepêşandanan kir. Xwepêşandana gelên Îranê li 512 navçe, 180 bajarok û 31 parêzgehên Rojhilatê Kurdistan û Îranê belav bûne. Heta niha 45 zanîngeh ji bo piştgiriyê tevlî xwepêşandan bûne.

### Bîlancoya 14`e rojên xwepêşandanê

Li gor amarên Rêxistina Mafên Mirov ya HRANA’yê, di 14 rojên xwepêşandanê de 2 hezar û 311 xwepêşander hatine binçavkirin, herî kêm 57 xwepêşander hatine kuştin, 7 ji wan zarok in û bi dehan xwepêşander jî birîndar bûne. Hatiye diyarkirin ku di nava xwepêşanderên hatine girtin de zêdetirî 167 jê zarokin û temenê wan ji 18 salî û jêr de ne. Her wiha 48 jê xwendekarên zanîngehê ne.

### Rêjîma Îranê dixwaze berxwedaniyê bişkîne û komkujiyan pêk bînin

Di roja 10`emîn a xwepêşandanan de xelkê bajarokên Avdanan û Melekşahî ku bi rojan di nava berxwedaniyê de bûn, li beramberî êrişên dewleta Îranê mafê xwe yê parastinê bikar anîn. Êrişên rejîmê bi berxwedaniyek mezin şikandin. Hêzên rejîmê neçar man xwe ji gelek taxan bi paş ve bikişînin. Di halê hazir de hêzên dewletê nikarin bikevin ti taxeke bajarên Avdanan û Melekşahî. Rejîm car bi car bi êrişên cuda dixwaze vê berxwedaniyê bişkîne û komkujiyan pêk bînin. Gelek ji hêzên ewlekariyê jî di nava qereqol û saziyên dewletê de ji tirsa dernakevin û ketine pozisyona parastinê. Bi taybet bi destpêkirina şevê re hêzên rejîmê dixwaze hêza gel bişkîne lê heta niha nekariye. Ne tenê li van her du bajarokan li navenda Îlamê jî berxwedaniyek



mezin heye û gel heta serê sibê li kolanên xwe nobetê digirin.

### Yên ku pêşengiya şerê kolanan bi rejîmê dikin dîsa jin in

Gelek baregehên leşkerî, qereqol û avahiyên walitiyan li piraniya bajaran tên şewitandin. Heta serê sibê li kolanên Îlam, Kirmaşan, Tehran, Şîraz, Meşhed û gelek bajarên din di navbera hêzên dewlet û xelkê de şer diqewime. Her şev jî bajarên nû li ser zêde dibin. Jixwe piranî di wexta şevê de gel li kolanan li ber xwe didin. Rojhilatê Kurdistanê va rojên dawî li ser Îlam û Kirmaşanê her wiha sînorê di navbera Başûr û Rojhilatê Kurdistanê de tevgerek hewayî ya kobra û skorskiyan jî heye. Ev tevgera hewayî ya dewleta Îranê dibe ji bo tirsandinê xelkê û xwepêşandanan jî be. her wiha yên ku herî zêde niha li kolanan pêşengiya şerê kolanan bi rejîmê dikin dîsa jin in. Jin rengê çalakiyan jî diguherînin. Tevlîbûna jinan dibe sedem ku tevahiya civakê li pey wan bimeşin û bi bajar yan jî beşek civakê re sînordar nemîne.

### Di hemû dirûşmeyan de peyva Azadî herî zêde tê bihîstin

Dirûşmeyên serhildanan nîşan dide ku gel êdî rejîma heyî naxwaze. Di hemû dirûşmeyan de peyva Azadî herî zêde tê bihîstin. Ev yek nîşan dide ku jin, ciwan û tevahiya gelên Îranî çiqas têhniyê azadiyê ne. Ji bo bidestxistina azadiya xwe amade ne canê xwe jî feda bikin. Bê tirs û du dilî berê xwe didin kolanan. Ji bo wê jî mîsogere ku wê sala 2026`an bibe sala



azadiya gelên îranî ji zilm û zordariyê. Buhara 2026`an buhara pêkhatina hêviyên gelên îranî ye û ya em dibînin meşa bi lez û bi israr a ber bi wê ve ye.

### ‘Bi sedan welatî hatine qetilkirin an jî bi riya darvekirinê hatin cezakirin’

Di vê çarçoveyê de Rojnamevam Aso Bêkes ji Rojnameya me re axivî û wiha got: “Piştî ruxandina Şahê Îranê û damezirandina rejîma Îranê, heta roja me ya îro, gelê Kurd qirkirinê re rû bi rû may e. Bi salane, sedan ciwanên Kurd bi polîtîkayên rejîma Îranê tên bi darvekirin. Ji aliyê aborî dewleta Îranê gelê Rojhilatê Kurdistanê bi birçîbûnê re rû bi rû hatiye hiştin. Ji koçberiya derveyî welat bûye karekî rojane ji bo welatiyên Rojhilatê Kurdistan ê. Di vî sedsala desthiladariya rejîma Îranê de, bi sedan serhildanên gel li Rojhilatê Kurdistanê li dijî rejîmê pêkhatiye. Serhildanên gel yên dawiyê, rêjîma bi şêwazekî howane destwerdanê mafên gel yên xwezayî dike. Her serhildanên ku pêkhatibû, bi sedan welatî hatine qetilkirin an jî bi riya darvekirinê hatin cezakirin. Serhildanên dawiyê bi dirûşmeya “Jin, Jîyan, Azadî” de destpêkir û heya niha bi tûndî berdewam dik e. Serhildanên gel yên niha berdewam dikin, heman serhildanên li ser şopa Jin, Jîyan, Azadî vejîn bûye û çirûska wê ji bajarên Melekşahî, Îlam, Kirmanşah û bi gelemperî bajarên Rojhilatê Kurdistanê bandor kiriye. Îro bajarên mezin weke Têhran, Tebrîz, Kirman, Şîraz, Isfahan, Xorasan, Yezd, Ehwaz û Benderbas berdewam dike. Aliyê Rojhilatê Kurdistanê de, bajarên weke Kamyaran, heta niha bi 4 şehîd hatine dayin. Melekşah komkuji û qirkirin li ser gelên sivîl hatiye meşandin û di encamê de 11 şehîd çêbûne. 8’ê berfembara 2026’an heya roja îro internet di tevahî Îranê de hatiye qutkirin.”

### “Bi giştî daxwaziya gel gûhertina rejima ku bi hişmendiya olî tê rêvebirin”

Bêkes di berdewamiya axaftina diyar kirk u Bi giştî daxwaziya gel gûhertina rejima ku bi hişmendiya olî tê rêvebirin û wiha pê de çû: “Ji aliyê şîrketa girêdayi DYA`yê bi navê Starlînk hîn bajaran peywendî tên kirin. Leşkerên giredayî rejîma Îranê gelek bajarên Îran û Rojhilatê Kurdistanê sivîl qetilkirine. Lê hîna bi awayekî rasterast bilonçoyekê zelal bidest nehatiye xistin. Bi giştî daxwaziya gel gûhertina rejima ku bi hişmendiya olî tê rêvebirin. Bandoriya serhildanên gel yên niha dimeşin wê Jin, Jîyan, Azadî bibe nîşaneya rê. Ew qonaxe ne weke serhildanên ku berê hatibûn têkbirin û wiha xuya ye, wê guhertin bi deshiladariya Îranê pêk bê. Ji ber ku rejîma Îranê hem ji aliyê aborî û hem jî aliya siyasî de têkçûye.

### ‘Pêwîst e mafê hemû pêkhateyan bê parastin’

Rojnamevan Aso Bêkes di dawiya aqxaftina xwe de wiha anî ziman: “Xwepêşandan û serhildanên gel bi tevlîbûna hemû aliyên demokrasîxwaz ve berdewam dike. Daxwaziya gel bi wan xwepêşandanan ya herî sereke ew e ku pergalekê demokratîk û nenavendî bê avakirin, di heman demê de mafê hemû pêkhateyan bê parastin. DYA`yî û Israîl weke gelek caran ji aliyê rayedarên wan hatine li ser ziman dijî dersthiladariya rejîma Îranê ne. Lê rastiyê de, dixwazin berjwendiyên xwe li Îranê de mîsoger bikin. Pergalekê li gorî berjewendiyên xwe di Îranê de bimeşînin. Êrîşên 12 rojan yên ku Israîle pêkanîbû, ew rastî bi resenî derxist holê de. Israîl û DYA`yî bi hevkariyekê li ser berjewendiyên xwe di navenda Îranê de dimeşînin. Ew çiqas li ser xwepêşandan bandor kiriye mijara nîqaşê ye. Herî dawî jî gelên Îranê hem Israîl, DYA û bi taybet jî Rusya re, bîrekê wan ya dîrokî ava bûye. Serdemên xwe de, gelek kiryarên xerab û komkujî li serê gelên Îranê de meşandine. Ji ber wê sedemê jî nayê bawerkirin ku DYA û Israîl bikare destwerdanê pergala nû ya Îranê de bike. Ji ber ku civaka herêmê pergala Dewlet-Netew weke berê napejirînin.”

# Jiyana zarokan di nav şer û koçberiyê de

Li Rojhilata Navîn, di nav şer û pevçûnan de rewşa herî giran û zehmet a zarokan e, ji ber ku zarok dibin qûrbaniyên sûcên êrişkar û dagirkeran. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê taybet li herêmên ku ji aliyê çeteyan ve hatine dagirkirin, şert û mercên ku zarok tê de mezin dibin, ne şertên jiyanê ne, şertên şidetê ne, zarokatiya ku tê jiyîn ne bi lîstin û xwendinê, lê bi tirs, koçberî û windabûnê dest pê dike. Îro jî em dibînin ku zarok di nav hêvî û tirsa koçberiyê de dijîn.

Amara Baran

Sûriyê ku di van salên dawiyê de ji aliyê hêzên hegemon ve bûye qada şer û pevçûnan. Bi sedema vê yekê jî tiştê ku tê meşandin bandorek neyînî li ser derûniya zarokan dike. Ji sala 2011'an ve Sûriyê di nav şerekî dirêj û aloz de ye û bandorên wê yên herî giran jî li ser zarokan dike. Bi taybet li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, her çiqas ji aliyê sîstemê ve xwesertiya xwe hebe jî, lê hê jî rewşa ewlehiyê, aborî û siyasî ne arame, ev rewş bi awayekî rasterast li ser jiyana zarokan tesîr dike. Ji ber ku di van şer û pevçûnan de yên ku herê zêde bandor dibin û dibin qurbaniyên berjewendiyên hêzên Hegemon zarok in. Zarok her roj bi şer û pevçûnan re rû bi rû dimînin ku li heremê bi dengê tang, topan, bi dîtina kuştin û qetlîaman mezin dibin. Di van şeran de koçberiya ku tê jiyîn xeyalên zarokatiyê têk dibin.

Ew şerên ku tê meşandin ne tenê ji bo dagirkirina axê ye, şerê li dijî jiyan nasname û hebûna zarok û gelan e. Gelek zarok ji aliyê dagirkeran ve ji mafê xwe yên jiyanê bêpar hatine hiştin, ne dibistan ne jî mafên wan yên jiyanê hatiye dayîn. Îro em dibînin ku bi hezaran zarok dibin qûrbana siyasêtên qirêj. Di sala 2014'an de di êrişên çeteyên DAIŞ'ê de, ji Şengalê heta Rojava, di heman demê de bi dagirkirina Efrîn, Serêkaniyê, Girê Sipî, heta bi dagirkirina Şehbayê re ku di sala 2024'an de ji aliyê HTŞ'ê ve hate dagirkirin, bi hezaran malbat ji cih û warên xwe koçber bûn. Gelek zarokên ku hatin qetilkirin jî hebûn. Îro bi hezaran zarok di bin konan de ji maf û xeyalên xwe qut bûne, gelo piştî ewqas kiryaran, em dikarin bêjin ku wê ew zarok bi awayek tendûrist jiyana xwe bidomîne?

Ji bo zarokan divê jiyan bi lîstin, xwendin û ewlehiyê derbas bibe. Lê di heremên ku şer tê de tê meşandin, ew şertên heyî jî têne windakirin, êdî dibistan bûne qadên ku şer tê de têne meşandin. Koçberî û êriş jiyana rojane ya zarokan xistiye nav tirsê de. Gelek zarok her roj bi tirs dijîn, bi xemgîniyê radibin. Ew rewş jî dehêle ku ji aliyê derûnî ve têk biçin. Koçberî li ser perwerdehiya zarokan jî bi awayekî giran tesîr dike. Gelek zarok ji ber şertên koçberiyê an jî astengiyên aborî dibistanê berdan e. Perwerdeya ku divê pêlêke rizgarkirinê be, lê li heremê bûye qurbana berjewendiyên Siyasî . Dibistan têne hedefgirtin, zarok



bi salan ji xwendinê dûr dimînin. Ev ne tenê qutbûna perwerdehiyê ye, ev qutbûna pêşerojê ye.

Di heman çarçoveyê de em mînaka îro bînin ziman ku di roja 6'ê Çileyê' de jî komên çeteyên hikumeta veguhêz û dewleta Tirk ku bi awayek hovane bi tang û topan êrişên taxên Şexmeqsûd û Eşrefiyê kirin. Bi hezaran malbat bi zarokên xwe ve bi qetlîaman re rû bir û man. Li ber çavê cîhanê zarok zindî, zindî hatin qetilkirin, ne vîcdan, ne jî ehlaqê mirovahiyê van kiryaran ku îro li ser wê gelê tê meşandin, hezim dike. Heleb a ku di nav hêvî û tirsê de bû, hemû kiryar û bûyer li ber çavên zarokan hat meşandin, wekê ku me di dîmenan de jî didît ku rojnamevanek ji zarokekî pirs dike dibêje we çi dît? zarok ev bersiv dide "Min her tişt dît, çeteyan li ber çavên me bi qezîfe û balafiran êriş kir." belê? ev kiryar li ber çavê cîhanê hat meşandin, lê xwe ker, kor û lal kirin. Çav û vîcdanê xwe girtin. Heta niha tu bertekên hêzên navnetewî derneketin. Qaşo kesên ku dibijin em parastina mafê mirovanan dikin, li ku bû?, gelo mimkûne ku bêjin me van qetlîaman nedît.? Tamam dibe kiryarên ku li Helebê hatin meşandin xwe jêre nedîttî kirin, lê hovitiya û çav soriya ku li Şengal, Efrîn û Serêkaniyê, hat meşandin de jî, heman bêdengî hat jiyîn. Tenê bi derxistina bilançoyên an jî raporên salan e ku ewqas zarok hatine qetilkirin, an jî din av konan de dijîn têrê nake û tu caran wê şert û mercên ku zarok tê de dijîn wê nede guhertin.

## Qehremanên vî zemanî



Farûk Sakik

Tirkiye xwestibû û ji aliyê hikûmeta demkî ya Şamê ve biryar hatibû girtin ku li dijî Kurdan şer bidin destpêkirin.
Ev şerê ku biryar dabûn, diviya ji aliyê Wezîrê Karên Derve yê Sûriyê Hesen Şeybanî ve biketa meriyetê û ji aliyê wî ve bihata birêvebirin.
Ahmed Şaraa yê ku ji bo Kurdan hên jî Colanî ye, ji bo xwe wek nealîgirê şer nîşan bide li gorî Tirkiyê tevgeriya û birêvebirina şer da Şeybanî.
Her tişt piştî civîna Şamê ya 4'ê Çileyê dest pê kir. Dema ku bang li QSD'ê kirin ku were Şamê, li ser 3 xalan li hev kiribûn jî. Rewş û statuya taxên Şexmaqsûd û Eşrefiye jî di nav vê lihevkirinê de bû. Hêzên navbeynkar biryar dabûn û herdu aliyan jî qebûl kiribûn da ku li Şamê werin gel hev û îmze bikin.
Di kêliyên hevdîtinê de Wezîrê Karê Derve Şeybanî dikeve hundir wezirê parastinê û berpirsyarê îstixbaratê derdixe derve. Piştî demekê vedigere hundir û dibêje; em îmze nakin û em ê di nava xwe de binirxînin piştre bersiv bidin.
Bersiv 2 roj şûnde êrişên 2 taxên Kurdan yên Helebê bû. Bi hemû hovîtiya xwe êriş kirin. Bersiv: wek 300 Spartayiyan ku di dîrokê de wekî yek ji sembolên herî mezin ên berxwedanê tê naskirin bû. Di bin fermandariya Key Leonidas de 300 leşkerên bijare yên Spartayî li hember 100 000 zêdetir leşkerên Persan şer kiribûn.
Ew roj, fermandar Ziyad û hevalên xwe li dijî artêş-çeteyên 2 dewletan berxwedanek dan destpêkirin.
Tê gotin ku gava qasidên Persan ji Leonidas re gotine "Çekên xwe radest bikin", Leonidas bersiv daye û gotiye: "Werin û bigirin" (bi yunanî: Molon Labe).
Belê bersiva Fermandar Zîyad jî bi vî rengî bû. Wî jî gotibû "Berxwedan Jiyan e". Ziyad jî dizanibû hejmar û hêza dagirkeran, wek Persiyan zêde ye.
Ji bo Spartayiyan di şer de mirin rûmeta herî mezin bû. Teslîm bûn di ferhenga wan de tune bû. Fermandar Zîyad jî ew roj got di ferhenga Kurdan de jî heman tişt tuneye.
Encam: Di encama hovîtiya mezin de 2 tax hatin wêrankirin, fermandar Ziyad jî bi dehan kes şehîd bûn. Ji gelên taxa Şêxmaqsûd û Eşrefiyê ji bo carek din vegerin axa xwe koçber bûn.
Şer bi dawî bû, herkes vegeriya û QSD wek hedef nişanda. Civaka Kurdan bi sîtemkarî û bi bendewarî, lê hin kes jî bi bê wicdanî wan şervanan tewanbarkirin. Wan şervanên ku hênjî birînên wan yên ji Kobanê, Efrînê, Serêkaniyê nekewînin, sûcdar kirin.
Dibêjin; madem ku roja 4'an hûnê ji taxa vekişiyanan, we çima roja yekem ev biryar negirt. Heger hêzên asayişe vekişiyana wanê hovitiya xwe bidomanda. Hincetên wan jî pir bûn. Bi gotina, ji taxa êrişî me kirine. Anjî bêhincet, wanê hovitiya xwe bidomanda. Enqere ev yek xwestibû û wê pêkbihata. Berxwedanê pêşî li hovîtiyên mezin girt.
QSD dikaribû li hawara wan here? Na.. Tirkiyê jî bi dron û SÎHA'yên xwe li benda tevgera QSD'ê bûn, da ku êrişî Rojava bikin. Sedemek pêşî girtina vê komkujiyên diha mezin bû. Sedema dudiyan fizikî midaxle kirin zehmetbû.
Di ragihandina Tirkiyê de her wek QSD'ê şer kirî û têkçûye weşan dikin. Komkujiya sivîlan vedişêrin. Heger dema ku ew vê yeke dikin, em jî QSD'ê tawanbar bikin bê ûcdanî dibe. Divê em li wan şervanên xwe xwedî derkevin.
Dive em bi hêza xwe bawerbin. Komkujiya Helebê carek dinan nişanda ku Rêber Apo çiqas mafdare dema behsa Amerîka û Îsraîl dike. Îsraîl di şahiya xwe ya peymana bi Sûruyê de bû û Amerîka jî di parastina berjewendiyên xwe yê rojhilatê Firatê de bû. Xema wan nebû komkûjî.
Dawî: Em ji Ziyad Heleb 'lêborîn bixwazin'.

## Senaryoyên xwînmij li ser dikê berdewam dikin



Zekî Bedran

Dewleta Tirk bê rawestan kar kir da ku Kurdên li Sûriyê û deskeftiyên wan ji holê rake berî ku hevsengiyek siyasî ya piştî rejîmê Baasê were avakirin û pergalek demokratîk were avakirin da ku cihê xwe negirin. Armanca wan ya sereke ew bû ku serweriya HTŞ'ê ava bike û pêşketinên Rêveberî û herîmîn Xweser asteng bike û pêşî lihevkirina bi Kurdan re bigire. Çawa ku rejîma Baasê Helebê derket, HTŞ û komên girêdayî wan hêzên xwe yên çekdar ber bi Şehba û Minbicê ve rêkirin. Ji van herêman dest pê kir, plan kir ku herêmên Rêveberiya Xweser bi êrîşên leşkerî têk bibe. Ev plan bi hêsanî ser neket. Paşê, peymana 10'ê Adarê di navbera QSD û hikûmeta demikî ya Sûriyê de hat îmzekirin. Li gorî vê peymanê, alî dê di çarçoveya peymanê de bibin yek, ango QSD û herêmên Rêveberiya Xweser dê bi Sûriya ku nû bê avakirin ve werin entegrekirin. Lê, Tirkiyê bi berdewamî destwerdan kir, bi tûndî li ser entegrekirina QSD'ê israr kir. QSD'ê di dema danûstandinan de ev yek pejirand,û li ser tevlîbûna artêşê bi rêbaza 3 yêkîniyan lihevkirinek hat çêkirin. Divîyabû danûstandinên dawî ya vê peymanê, di civîna 4'ê Çileya 2026'an de were temamkirin û îmzekirin. Lê Tirkiyê destwerdan kir û pêşî lihevkirinê girt. Di vê navberê de, li Parîsê di navbera Îsraîl û hikûmeta demikî a Sûriyê de, bi navbeynkeriya DYA, hevdîtin pêk hatin. Naveroka van hevdîtinan bi tevahî ji raya giştî re nehatiye eşkerekirin. Lê, eşkere ye ku DYA ji bo êrîşên li ser Kurdan çiraya kesk pê xist. Metirsiya Tirkiyê ya herî mezin ew bû ku Îsraîl piştgiriyê bide Kurdan. Hikûmeta demikî jî kêm, zêde hesab dikir ku ew bêyî Îsraîl û DYA nikare li ser deshilatê bimîn e. Tirkiye hewl dida ku bi awayekî ji DYA piştgirî werbigire û nakokiyên xwe yên bi Îsraîlê re ji holê rabike. Wisa xuya dike ku ew li Parîsê li ser van mijaran gihîştine rêkeftinekê zelal. Ji ber ku di roja 2'emîn a vê civînê de, êrîşên li ser taxên Kurdan ên li Helebê dan destpêkirin. Rayedarên Tirk piştî destpêka sala nû gefên xwe zêde kirin. Me her gav dixwest rave bikin, ku desthiladariya Tirk hewl dide ku peymana 10'ê Adarê têk bibe û şer dest pê bike. Peyman li ser bidawîkirina pevçûnê û bidestxistina yekîtiyê bû. Lê rayedarên Tirkiyê dixwest vê yekê li ser bingeha jiholêrakirina QSD û Rêveberiya Xweser bixe pratîkê. Wan bi berdewamî israr dikir ku heke ew vê yekê nekin, dê hêz li dijî wan were bikaranîn. HTŞ nekarî helwest nîşan bide. Li şûna ku li hember vê lîstika şer bisekine, xwest bi wergirtina piştgiriyê ji dewleta Tirkiyê serweriya xwe zêde bike. Ger HTŞ helwesteke kêm jî be demokratîk hebûya, ew ê ne ba piştevanê ji vê lîstika xwînmij ya Enqerê re. Tirkiyê amadekariyên xwe yên şer hertim didomand. Berê, digot ku ew ê bi hêz û leşkerên xwe rasterast êrîş bike. Vê carê, destpêkir ku bêje ger hikûmeta demikî bixwaze ew ê her cûre piştgirî bidin wan. Dixwest şer wekî şerekî navxweyî yê Sûriyê nîşan bide, bi vî şêwazê xwe ji berpirsiyariyê dûr bixe. Dema ku tişt li gorî dilê wan diçin, ew hewcedariya veşartina wê jî nabînin. Bi rastî, dema ku êrîş li ser taxên Kurdan ên li Helebê hat destpêkirin, ragihandina şerê taybet a Tirk, bi tevahî aliyê xwe dan xûyakir in. Ragihandina alîgir ev yek wekî şerê xwe dît û eniyekê li dijî Kurdan vekir. Her kes dizane ku ragihandina alîgir bêyî fermana hikûmetê tiştekî wisa nikare bike.
Bi wijdan û çavên xwe yên kor bûn, wan hewl da ku ji raya giştî re bibêjin ku hêzên parastinê yên li taxên Kurdan ên dorpêçkirî êrîşî artêşa hikumeta demikî dikin. Van taxan hêza xwe ji bo parastina xwe ji êrîşên çeteyan û rejîmê zêdetirî deh salan hêzekê rewa ava kiribû. Wekî din, di 1'ê Nîsanê de bi rayedarên HTŞ'ê re peymanek hat çêkirin, ku parastina van taxan ji hêzên herêmî re bê hişt in. Ev hêza parastinê ya herêmî çawa dikare ji bo artêşa Şamê bibe gef, an jî bi çi hişmendiyê dikarin êrîşî wan bikin? Wekî ku tê dîtin, rayedarên Tirk sînorên aqil û wijdanan derbas dikin da ku ji bo êrîşê hincetek biafirînin. Hêzên HTŞ û SMO êrîşên hovane pêk anîn, careke din navên xwe li ser her cûre tawanên li dijî mirovahiyê û sûcên şer dan nivîsandin. Lê çapemeniya Tirk manşetên ku digotin taxên di bin dagirkeriya QSD'ê bûn hatin rizgarkirin, weşandin. Gelo HTŞ û SMO dê azadiyê bînin van her du taxên ku li dijî rejîm û çeteyan li berxwedanî kirin û bedelên giran dan? Wekî ku tê dîtin, li her herêma ku QSD û hêzên parastinê lê nînin, komkujî û qirkirinên li dijî mirovahiyê hene. Gelo QSD li herêmên Elewî û Durzî hebûn? Eger hêzên parastinê li wan herêman hebûna, dikarîbûn pêşî li wan komkujiyan jî bigirin. Lê welatîyên wan herêman bêparastin bûn. Komkujî rasterast li dijî gel hatin kirin. Îro, erkê rewakirina van hêzên kujer û tûndrew û rêzê nîşandan sûcên wan ketiye ser milê çapemenî û rayedarên Tirkiyê. Piştî hewldanan ku qet nebe bi demkî jî pêşî li komkujiyan bigirin, hêzên parastinê ji Helebê derketin. Lê, nûçe û wêneyên li ber destê raya giştî nîşan didin ku HTŞ û komên girêdayî wan pabendî tu rêkeftinê nebûne û hovîtiyên xwe berdewam kirin. Di dema êrîşên li Helebê de, helwestên nîjadperest yên dijî kurd û hişmendiya nefretê pêş ket. Zemîn ji bo kûrkirina nakokiya Kurd û Ereb, belavkirina pevçûnan tê amadekirin. Diyar e ku êrîş dê bi tenê li Helebê ve sînordar nebin. Abdulkadir Selvî, yên xûlamê xwediyê xwe, dinivîse ku di meha Sibatê ji bo êrîşên li ser herêmên din wer in destpêkirin. Êşa bi mîlyonan kesan, komkujî û qirkirin wekî lîstokek be, bi xwînsariya kesekî ku dibêje agir sor bike, wekî lîstikekê tê nişandan û ji rêzê tên nîşandan. Divê her kes li hemberî kiryarên ku dê li dijî van lîstikên xwînmij hişyar be û çi pêwîst be wer e kirin!



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

Helbestvan Ebûdê Mexso çiraxek vêketî ye ku ronahiya wê bi salan nehatiye vemirandin. Wî ji kaniyên wê yên xweşav bingehên zanist û zanînê wergirtiye û ji dîroka kevnar a Girê Mozan, Şermola û Çaxirbazarê, ruhê xwedîbûn û dilsoziya bi ax û dîrokê re îlham wergirtiye.

Can Yûsiv

Dema ku welat bindest û perçe perçe be, gel kole û bindest dibe, helbestvan û nivîskar radibin pênûsa xwe li ber zilmê wek çekan hildigirin, gotinê dikin gulleya hişyariyê û helbestê dikin çira ku riyên gelê xwe ronî dike.

Helbestvan Ebûdê Mexso yek ji wan helbestvanên ku jiyana xwe ya torevanî û rewşenbîrî ji bo gelê xwe û doza ya netewî terxan kirine û ximava pênûsa xwe kiriye navgîna parastina zimanê Kurdî, parastina nasname û geşkirina agirê xwedîbûnê di wijdanên nifşan de. Di dilê bajarê Orkêş, Amûda Bavê Mihemed de, ew bajarê ku xwe dispêre sînorên Bakur û Rojava, û têlên şermê û riswatiyê yên ku mêtingeran di dilê Kurdistanê de çandine, wan ji hev vediqetînin û di hembêza Deşta Sinceqa Sadûn de, ku jê bêhna bîranînên Mîtanîyan û Hûriyan difûrin û henaseyên Bedirxaniyan û Botaniyan jê dibarin, Ku bibû dergûşa şaristanî û dîrokê, û mêrga wate û zimanê Kurdî yê resen, herwiha hîna jî peyv weke kulîlkekê lê şîn dibe û zuha nabe, bi nivîskar û helbestvanên xwe ve diherike.

Ji axa wê mezinên tîpa Kurdî hatine jiyanê mîna Selîm Berekat, Ehmed Huseynî, Dilawer Zengî, Mihemed Nûr Huseynî û xeynî wan ji parêzvanên ziman û nasnameyê.

Li ser wê xaka pîroz, helbestvan û nivîskarê Kurd Ebûdê Mexso di sala 1966'an de, li gundê Dawidiyê yê ser bi Amûdê ve, ji dayîk û bavek Kurd (Qasim û Sêda) hatiye dinyayê, di malbateke kurdperwer ya kedkar û welatparêz de ku ji çar bira û çar xwîşkan pêk dihat mezin bûye, dê û bavên wan ew bi dilsoziya ax û welat mezin kirine û di dilê wan de nirxên resen ên kurdîtiyê çandine û li ser dilsoziya bo nasname û rehên xwe firşk kirine.

Wî zarokatiya xwe li taxên gundê xwe Dawûdiyê derbas kir, ku bêhna nanê tenûrê yê germ ji kolanên wê yên teng dibariya û dengê kehr û berxikan ji mêrg û zozanan bilind dibûn, ew di hembêza xwezaya wê ya bedew de mezin bû, ku bi bedewiya xwe giyan şa dike û birînan rehet dike, wî ji sirûdên jinên li zeviyan û ji stranên şivanan ên li mêrgan yekem gotinên xwe yê hûnandina helbestê xêz dikir.

Wî ji kaniyên wê yên xweşav bingehên zanist û zanînê wergirt û ji dîroka kevnar a Girê Mozan, Şermola û Çaxirbazarê, ruhê xwedîbûn û dilsoziya bi ax û dîrokê re îlham girt, ku li wir kevir şahidiya çîrokên bav û kalan û xewnên nifşên paşerojê dikin,

Wî xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe Dawidiyê û gundê Bîrziravê xwendiye, paşê xwendina xwe ya amadeyî û lîseyê li bajarên Hesekê û Qamişlo berdewam kiriye, û paşê di sala 1985'an li bajarê Qamişlo tevlî peymangeha amadekirina mamostayan, beşa perwerdehiya taybet dibe, lê di sala 1987'an de ji ber xebatên xwe yên wêjeyî û siyasî û piştgiriya bi tevgera azadiya Kurd re ji kar hat dûrxistin û nehiştin ku pîşeya xwe bikar bîne.

Helbestvan Ebûdê di sala 1988'an de zewicîye û ew bavê pênc zarokan e (sê kur û du keç), û ji sala 1979'an heta îro tevî malbata xwe li bajarê Qamişlo dijî.

Helbestvan Ebûdê bi saya dîwanên nemir Cegerxwîn fêrî nivîsandina bi Kurdî bû; Ev rûpel bûn dibistana wî ya yekem û kilîtên hişmendiya wî ya zimanî û wêjeyî.

Di sala 1981'an de dest bi nivîsandina helbestê kir, dema ku helbest welatê xwe yê biçûk, û penageha xwe ya germ didît ku ji sermaya rastiyê biparêze, û li ber tarîtî û bêhêvîbûnê pizotên peyvê pêbêxe.

Hem Cegerxwîn û hem jî Osman Sebrî bandorek kûr li ser avakirina hişmendiya wî ya torevanî û rewşenbîrî hiştin, ji wan ruhê berxwedanê, rehwanbêjiya xwedîbûnê û baweriya bi gotinê weke welatekî din ê ku nayê dagirkirin, hîn bû.

Herwiha peywendiyên wî yên wêjeyî û çandî yên nêzîk bi helbestvan Sedayê Tîrêj û Salihê Heydo re hebû û xema neteweperestî û afirîneriya ji dil a Kurdî bi wan re parve kir, bi hev re li ser rêya gotina azad meşiyan, çiraya helbestê di tariya sirgûnê de, û dengê welat di bêdengiya jibîrkirinê de hilgirtin.

Di wê qonaxa dijwar a dîroka peyva Kurdî de, helbest ji bo wî ne tenê hunerek bedewî an hestekî xweşbînî bû, lê kiryarê berxwedana zimanî û çandî bû, wî zimanê Kurdî fêr kir di malan de, ji xort û keçan re, di nav komên piçûk ên ku mîna şaneyên veşartî yên hêviyê, ew di baweriyê de bû ku tîpa Kurdî berevaniya dîwara dawî ye nasnameya neteweyê dike û rûmeta wê diparêze.

Ebûd Mexso ne tenê helbestvan bû, lê ew çalakvanek çandî û rewşenbîrekî dilsoz bû, ku peyama hişyarî û ronakbîriyê li ser milê xwe hilgirt di demeke ku pir bêdengî û kêm rastî hebû.

Ew yek ji damezrînerên herî diyar ên Pêşangeha Şehîd Herekûl tê hesibandin, ew avakariya ku bûye menberek ji bo bîranîna peyva Kurdî û muzexaneyek ji bo rehjena afirîneriya berxwedanê.

Di navbera salên 2017 û 2020'an de û piştre di navbera 2022 û 2025'an de hevserokatiya Yekîtiya Rewşenbîran li herêma Cizîrê girt ser milê xwe û li wir ji bo xurtkirina rola rewşenbîrê weke pêşengê hişmendiya kolektîf û parêzvanê nasname, ziman û mîrasê kar kir.

Di heman demê de tevlî koordînasyona Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) bû, çand xiste navenda çalakiyên rizgarî û civakî û di wê baweriyê de bû ku avakirina mirovahiyê gava yekem a avakirina neteweyê ye.

Herwiha endamekî çalak ê Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cezîrê ye, û niha jî hevserokê Nivîsgeha Rêxistinî ya Bakur û Rojhilatê Sûryayê ya Tevgera Civaka Demokrat e.

Beşdarî gelek şevbuhêrk û festîvalên helbestan li piraniya bajarên Rojava bû, û hertim di çalakiyên çandî de amade bû, helbestên xwe wek ala hesret û rûmetê hilgirtibû, di wê baweriyê de bû ku peyva azad ji guleyan bihêztir e, û helbest dikare bibe pirek di navbera bîr û paşerojê de.

Ebûd Mexso bi hemû şêweyan helbesta Kurdî nivîsiye ji helbesta klasîk a terazû ya bi rêzbend û kêşe heta bighêje helbesta azad, nûjen û pexşan, jêhatîbûna wî yên wêjeyî tenê bi nivîsandina helbestê re sînordar nema; lê her weha roman, kurteçîrok û gotar jî nivîsand, li kêleka helbestê.

Ji berhemên wî yên wêjeyî, wî heft dîwanên helbestê bi zimanê Kurdî û romanek yekane weşandine, ev berhem di navbera nûjeniyê û klasîkê de cihêrengin û rêwîtiya wî ya rewşenbîrî û hestyarî diyar dikin:

1. Kulîlkên Zozanan -Helbestên nûjen.
2. Vîn û Viyan - Helbestên nûjen.
3. Xemla Welat - Helbestên nûjen.
4. Zindana Evînê -Helbestên nûjen.
5. Çavkanîyên Jiyanê - Helbestên nûjen.
6. Pêlname - Helbestên klasîk.
7. Sîroda Vejînê li Qada Tekoşînê - Helbestên klasîk.
8. Qelen- Roman

Berhevoka wî ya helbestan "Zindana Evînê " ji aliyê nivîskar û rexnegirê kurd Xalis Misewar ve ji kurdî bo erebî hatiye wergerandin.

Herweha çend destnivîsên wî yên wêjeyî û rewşenbîrî yên neçapkirî jî hene, ji wan:

1. Du dîwanên helbestên nûjen.
2. Yek berhevoka kurteçîrokan.
3. Pirtûka gotaran a bi sernavê "Gotinên li ser Şoreş û Ramanê".

Gelek ji hunermend û komên navdar ên Kurd gotin û helbestên wî gotine, ji wan:

1- Danîş Botan: Hay Gul.
2- Soniya Omerî: Kuro Dîno.
3- Koma Cûdî: Qada Rûmetê.
4- Koma Hîlala Zêrîn: Arê Xanê - Birîn Kûre.

Di qada çand û wêjeya kurdî de xwedî hebûneke berbiçav bû û gelek kanalên televizyonê û malperên Elektronîk bi wî re hevpeyvîn kirine, ji wan:( Ronahî, Strêk, Rojava, Rûdaw, Kurdistan TV û hwd).

Herwiha gelek rojname, kovar û malperên Kurdî jî berhemên wî yên wêjeyî weşandine û bi wî re hevpeyvîn çêkirine, ji wan: (Şermola, Sîwan, Ronahî, Bûyer, Welat, Wîfaq û hwd).

Di encama xebatên xwe yên wêjeyî û çandî de, ji aliyê gelek saziyên wêjeyî û çandî ve hat xelatkirin:

1. Xelata Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) – di sala 2016'an de.
2. Xelata Desteya Çandê ya Herêma Cezîreyê – di sala 2019'an de.
3. Xelata salane bi navê helbestvan Seydayê Tîrêj, ji aliyê Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cezîreyê.
4. Xelata Festîvala Edebî ya Duyemîn li bajarê Reqa, ji aliyê Desteya Çandê ya Bakur û Rojhilata Sûriyê – 2025'an.
5. Xelata Enstîtûya Kurdî li Stokholmê.
6. Spasname û rêzgirtin ji aliyê Yekîtiya Navneteweyî ya Çapemeniya Erebî, bi hevkariya Rewşenbîrên Ereb.



7. Spasname û rêzgirtin ji aliyê Yekîtiya Kurdan li Sûriyê – 2023 (li ser çîrokê).
8. Xelata Pêşangeha Herekûl di dora xwe ya nehê de li Qamişloyê, ku li wir dîwanek helbestî bi zimanê kurdî ji bo wî hate çapkirin.

Helbestvan Ebûdê Mexso ne tenê dengekî derbasdar bû di dîmena kurdî de, lê ew bû wijdanek gotindar bi navê ax û azadîyê; wî bi gotinê nasname çêkir û bi helbestê welatek avakir.

Wî ji bo welat û bedewiya xwezaya wê, ji bo şehîd û şehsiwarên Kurdan, ji bo azadî û rûmetê, ji bo şoreş û şoreşgeran, ji bo jina Kurd û têkoşîna wê, ji bo hezkirin û eşqê nivîsî. Gotinên wî ne tenê bi xîmavê hatine nivîsandin, lê bi wijdanê nifşên ku di helbesta wî de penageheke ji tunebûnê û bîreke ku li ber jibîrkirinê berxwe dide hatiye nivîsandin.

Ebûdê Mexso dê herdem çiraxek li ser rêya peyva Kurdî bimîne û şemalek ku venamire heya ku di vê neteweyê de hinek kes hene ku dinivîsînin, distrirînin û xeyalên azadiyê dikin, tevî zor û zehmetiyên ku pê re rû bi rû maye jî hîn di xurtbûna dan û afirîneriya xwe de ye, ew di nav gelê xwe de pêdar maye, helbestan dinivîse û tîpên xwe wekî dir û gewheran ji binê deryayê hildibijêre û çîrok û çîvanokan bi xêzên evîn û hesretê vedirêse, bê west û rawestandin, ji cîhanê re bi dengê bilind dibêje:

"Em li vir in, û em naçine, heya ku dilên me bilebite ji bo jiyanê û diwêta pênûsên me tîpên zêrîn belav bike."

Di karê wî de serkeftin û afirîneriyek zêdetir dixwazim.

# Dibistanên bajarê Tebqayê tên çaksazkirin

Desteya Perwerdeyê ya bajarê Tebqayê di nîvê sala 2025'an de dest bi projeyê çaksazkirin û ji nûveçêkirina dibistanên ku ji ber şer bandor bûne kiribû, hejimarek ji dibistanan hetine sererastkirin û heta niha proje berdewam e.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Desteya Perwerdeyê ya bajarê Tebqayê ji bo temamkirina projeyên xwe yên sererastkirin û ji nûveçêkirina dibistanên bajarê Tebqayê dixebite, ev piroje di nîvê sala 2025'an de hatibû destpêkirin û hejmarek mezin ji dibistanan hatine sererastkirin. Heta niha jî ev proje berdewam e û dema bidawîbûna wê ne diyar e.



**Dibistanên seretayî**

Sererastkirina Dibistana Elsewra û Besam Hemşo bi dawî bûne. Xebatên serastkirinê ya dibistana Kornîş jî ber di dawî ve diçe. Herwiha Mesrefa nûjenkirina van dibistanan bi qasî 550 hezar dolarê Amerîkî bû û li wan dibistanan 2 hezar û 600 xwendekar bi cih bibin.

**Dibistana Navîn**

Dibistana Basil ya Navîn ji aliyê rêjîma Baasê ve weke navendekê dihat bikaranînin. Lê niha ji aliyê Desteya Perwerdeyê ya bajarê Tebqayê ve tê serrastkirin, wê zêdetirî hezar û 500 xwendekaran lê werin bicihkirin. Niha dibistana Navîn a Dibsî Afnan, El Xemamîz, Xecer, Muşrif Elsab ji nû ve tên çêkirin û sererastkirin. Herwiha lêçûna dibistana Dibsî Afnan 135 hezar û235 dolar bû, a dibistana El Xemamîz lêçûna wê 36 hezar 82 dolar bû. Lê belê lêçûna dibistana Xecar 90 hezar û 8 dolar bû, lêçûna dibistana Muşrif Elsab 76 hezar û 607 dolar bû. Ev dibistanan bi hev re wê 2 hezar û 750 xwedekarî werbigirin.

**Dibistanên Amedehî**

Dibistana El bûasî û Ceber yên amedehî hatin sererastkirin. Ev dibistanan pêwîstiya wan a lezgîn hebû ku werin serrastkirin. Herwiha xwendekar neçar bûn ku ji bo çûn û hatina dibistanê rêya dirêj bikin û ev yek ji bo xwendekarên dibistanê dibû prsgirêk. Ji ber vê yekê, Desteya Perwerdeyê ya bajarê Tebqayê pêwîstî dît ku van dibistanên amadehî ji nû ve çêke. Da ku pêvajoya perwerdeyê hêsan bibe û gihiştina xwedekaran ji bo dibistanê jî hêsan bibe. Lêçûna nûjenkirina dibistana El bûasî 50 hezar û 673 dolar bû, ya dibistanan Ceber 86 hezar û 651 dolar bû. Ev her du dibistanan wê zêdeyî 650 xwendekar lê werin bicihkirin.
Niha dibistanan Fayîz Mensûr tê nûjenkirin û xebatên nûjenkirina wê ji sedî 50'î qediyaye. Herwiha lêçûna wê 135 hezar û 39 dolar e û ev dibistan mezintirîn dibistanan di bajarê Tebqayê de ye. Lê belê wê xwendekar di demên pêş de lê werin bicihkirin. Weqfa Zimanê Kurdî lêçûna sererastkirina wê gihaşt 109 hezar û137 dolarî. Dibistanana Mezret Herîr hat serrastkirin û lêçûna wê 43 hezar û yek dolar bû, ev dibistanan wê zêdeyî hezar û 905 xwendekar lê werin bicihkirin.
Bi vî awayî, lêçûna giştî ya projeyê Desteya Perwerdeyê li bajarê Tebqayê yê ji bo sererastkirin û nûjenkirina dibistanan digihêje milyonek û 467 hezar û 218 dolarê Amerîkî ku ev yek ji bo dabînkirina şert û mercên perwerdehiyê yên guncaw. Herwiha li wan dibistanên ku hatine serrastkirin 7 hezar û 255 xwendekar wî werin bicihkirin.

# Nexweşiyên zeviyên çandiniyê li Sûriyê

**Diyala Nîdal\Qamişlo**

**Zeviyên çandiniyê li Sûriyê rastî astengiyên mezin tên, di encama belavbûna nexweşiyên çandiniyê ku bi awayekî rasterast bandorê li ser berheman dike. Di heman demê de ji ber şert û mercên avhewayê û kêmbûna xizmetên çandiniyê, ev nexweşî yek ji girîngtrîn astengiyên ku li hember ewlehiya xurekê derdikeve.**



Li vir em ê behsa girîngtirîn nexweşiyên ku bandorê li berhem û çandinya Sûriyê dikin, sedemên belavbûna wan, bandora wan li ser çandiniyê, bikin.

**Girîngtirîn kêzikên ku bandorê li berhemên çandiniyê li Sûriyê dikin**

**Kêzika Sûna(nexweşiya genim a herî xeternak)**
Kêzika Sûna yek ji nexweşiyên herî xeternak e ku bandorê li genim li Sûriyê dike, nemaze li Hama, Idlib, Hesekê û Reqayê. Ev kêzik genim dixwe, dibe sedema qelsbûna genim û kêmbûna hem di rêje de û hem jî di kalîteyê de.

**Kurmê El-Heşid yê payîzê**

Ev kêzik di salên dawî de bi berfirehî belav bûye û bi giranî bandorê li genim dike. Rêjeya wê ya bilez a zêdekirinê ew kiriye yek ji zirarên herî xeternak li erdên çandiniyê yên Sûriyê.

**Mêşa Spî**

Ev kêzik di nava sebzeyên wekî bacanê sor, xiyar û kartol belav dibe, di heman demê de dibe sedema zerbûna pelan û gelek nexweşiyên vîrusî vediguhezîne.

Nexweşiyên Fungî yên çandiniyên Sûriyê de belav dibin

**Zengila Genim**

Yek ji nexweşiyên fungî yên herî belavbûyî ye, ew bi sê awayan xuya dike: zer, qehweyî û reş. Ew dibe sedema qelsiya nebatan û zuwabûna pelan.

**Nexweşiya Dereng**

Bandor li kartol û bacanan dike û di şilbûna zêde de belav dibe, dibe sedema rizîna nebatan û windahiyên giring.

**Beyad Deqîqî**

Di tirî û kundir de belav dibe, ew wekî tozek spî xuya dike ku nebatan qels dike û berhemê kêm dike.

**Rodent, çûk û bandora wan li ser hilbirînê**

**Mişkê Zeviyê**

Êrişî tov û rehenên daran dke, li deverên hişk û kêmbaran bi awayekî zêde belav dibe û dibe sedema windahiyên giring di berhemên genim de.

**Çivîk û qijikan**

Êrişî zeviyên genim û gulberojê dike û beşek mezin ji fêkiyên teze dixwe.

**Sedemên belavbûna nexweşiyên çandiniyê li Sûriyê**

**Guhertina Avhewayî**

Germahiya bilind û barîna kêm dibe sedema ku kêzik di tevahiya salê de çalak bin.

**Kêmbûna dermanên bi bandor û bihayên bilind**

Ev yek dibe sedema derengiya li hember rû bi rûbûna nexwşiya ku dibe sedema belavbûnê.

**Kêmbûna hişyariyên çandiniyê**

Nebûna çavdêriya zeviyan a pisporî ku bûye sedema qelsbûna rêvebirina çandiniyê.

**Bandora nexweşiyên çandiniyê li ser berhem û bihayên herêmî**

**Kêmkirina berhema genim û sebzeyan**

Ji ber nexweşiya Sûna û kurimê Heşid hilberîna berhemên bingehîn li Sûrîyê kêmbûye.

**Zêdebûna bihayên berhemên çandinîyê**

Kêmkirina hilberînê bûye sedema bilindbûna bihayan, ku bandorê li ser xerîdaran û aboriya herêmî dike.

**Gef li ser Ewlehiya Xurekê**

Belavbûna berdewam a nexweşiyan dibe sedema windakirina deverên berhemdar ên giring ku gefê li ewlehiya xwarinê dixwe.

**Nexweşiyên sereke li herêmên cuda yên çandiniyê:**

Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê: Kulîçê genim, kêzikên sor û kurmikên genim pir in.
Perava Sûrî: Ji ber şilbûna zêde, nexweşiya derend û Beyad Deqîqî pir belav in.
Herêma El-Xab û Hema: Nexweşiya Sûna ya genim pir belav dibe.
Gundewarê Şamê: Mêşên spî, kêzikên sor û zuhabûna fungî ya li ser sebzeyan tijî ye.

**Pêwîst e ku berî nexweşî li şînatiyê derkeve were dermankirin**

Pêwîst e ku berî nexweşî li zeviyan derkeve were dermankirin, da ku dema nexweşî di zeviyên çandiyê dederkevin bi awayekî zû ew nexweşî bi dawî bibin.
Di encamê de, ji bo çareserkirina nexweşiyên berhemên zeviyên çandiyê, pêwîstî bi çavdêriyeke berdewam heye, da ku mezinbûna berhemên zeviyan yên saxlem were misogerkirin. Şopandina baldar û plansaziya pêşwext rêya herî baş e, ji bo parastina zeviyan û bidestxistina encamên baş ji bo cotkaran di demsala zivistanê de.



# 'Êrişa li ser Rojava, êrişa li ser hemû Kurdên çar parçeyên Kurdistanê ye'

Rojnameger Mehmet Alî Ertaş û Rêvebera Federasyona Girtiyan Emîne Kaya diyar kirin ku çeteyên hikumeta demkî ku dewleta Tirk piştgiriyê dide wan, cureyeke din ên DAIŞ'ê ne ku van çeteyan hemû sûcên şer û li dijî mirovahiyê li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê pêk anîn, lê rastî berxwedaniyeke bêhempa û çalakiyên fedayî hatin û gotin, "Êrişa li ser Rojava, êrişa li ser hemû Kurdên parçeyên Kurdistanê ye."

**Ronahî Sadûn**

Di 6'ê Çileya 2026'an de çeteyên girêdayî hikumeta demkî a Sûriyê, bi piştgiriya dewleta Tirk êrişeke hovene ya bikaranîna hemû cureyên çekên giran li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiye yên Helebê pêk anî. Li hemberî vê yekê, gelên taxê û hêzên berevaniyê (Hêzên Ewlekariya Hundirîn) bi biryardayîneke mezin xeta berxwedanê hilbijartin. Armanca sereke ji van êrişan jî qirkirina gel û têkbirina vîna wan a berxwedêr bû. Lê Hêzên Ewlekariya Hundirîn li ser biryara Meclisa Gel a Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê biryara berxwedanê û parastina rûmeta xwe heya kêliya dawî da. Bi vî ruhê fedaî berxwedaneke dîrokî raber kirin, canê xwe feda kirin û teslîmiyet red kirin. Di encamê de gelek sivîl û endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn a her du taxan şehîd bûn, bi sedan jî birîndar bûn. Lê rojên berxwedanê ne tenê roj û derbas bûn, di nava van rojan de destanên lehengiyên yên Berîtan, Arîn û Egîdan ji nû ve vejîn bûn. Têkoşeran careke din li hemberî bêdengiya cîhanê, rûmeta xwe parastin û gelê xwe biser xistin. Ji ber ku berxwedanî xeta Kurdan a ji bo jiyana birûmet e. Ne dîrok û ne mirovahî kare vê yekê ji bîr bike ku qehereman kî ne û xwînmijên mirovan kî ne.
Derbarê berxwedana Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, Rojnameger Mehmet Alî Ertaş û Rêvebera Federasyona Girtiyan Emîne Kaya ji Rojnameya me re axivîn.

**'Gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê destdirêjî axa tu kesî nekirin'**

Mehmet Alî Ertaş di destpêka axaftina xwe de êrişên li dijî Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê şermezar kir û wiha got: "Di serî de ez êrişên ku li dijî gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hatin kirin, şermezar dikim. Her mirov, her civak, her bawerî û her zindî xwedî maf e ku xwe biparêz e. Şêniyên taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê niştecihên taxê bû. Şêniyên van taxan bawerî û nasnameya wan çi dibe bila bibe, xwedî maf bûn ku hem xwe biparêzin û hem jî xwe di aliyê aborî, siyasî tenduristî, perwerde, ewlehî û hemû qadên jiyanê de, bi rêve bibin. Wan tu carî êrişî mafê tu kesî nekirin. Destdirêjî li ser ax û warê tu kesî nekirin. Lê zêdetirî 4 mehan di bin dorpêça hikumeta demkî û komên Emşat, Hemzat ên girêdayî Tirkiyê de man. Vê hikumetê ambargoya lojîstîk, aborî, tenduristî û hwd... danî ser gelên van taxan. Di heman demê de gelên van taxan hatin tecrîdkirin. Ev tecrîd îşkenceyek li dijî peymanên mafên mirovan ên gerdûnî û Navtewletî ne."

**'Çete hemû berhem û projeyên dewletên girêdayî NATO yê ne'**

Mehmet Alî Ertaş anî ziman ku êrişkarên wekî Emşat, Hemzat, Sultan Murad û hwd... hemû çete ne û wiha pê de çû: "Çeteyên Emşat, Hemzat û Sultan Murad wekî DAIŞ'ê hemû berhem û projeyên DYA, Îsraîl, Îngiltere, Fransa, Almanya, Qeter û Tirkiyê ne. Di encamê de hemû projeyên dewletê girêdayî NATOyê ne. DYA û Îngiltere di serên salên 2000'î de xwestin projeya mezin a Rojhilata Navîn bixin meriyetê. Ji bo vê projeyê bixin meriyetê, serî li gelek plan û projeyan didin. Dagirkirina Iraqê, Kuweytê, pêşxistina El Qaîde, avakirina DAIŞ'ê, El Nusra, hemû berhemên van projeyan in. Îro ev komên çeteyan bi ferman, perwerde û lojîstîkên van dewletan li ser axa Sûrî bi cih bûne. Di heman demê de bi ferman û alîkariya Tirkiyê, Fransa, DYA û Îsraîlê, Idlib, Efrîn, Serêkaniyê, Bab, Girê Spî dagir kirine."

**'Çeteyên hikumeta demkî cureyekî din ên DAIŞ'ê ne'**

Mehmet Alî Ertaş eşkere kir ku êrişê li dijî taxên Kurdan, êrişên li dijî pergala Modernîteya Demokratîk e û wiha domand: "Hikumeta demkî bi hevkarî û alîkariya Îsraîl, DYA û Îngiltere Şam dagir kir. Ev hikumet projeya van welatan e. Ev hemû jî li dijî pergala Modernîteya Demokratîk, pergala Rêveberiyên Xweser, entegrasyona demokratîk û li dijî neteweya demokratîk in. Lewra ji ber ku li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Rêveberiyên Xweser a Demokratîk hebû, ev êrîş pêk hatin. Wekî ku çawa li Efrînê Rêveberiya Xweser a Demokratîk hebûn, êrîş kirin û dagir kirin, bi heman armancê êrişî van taxan jî kirin. Êrişa li dijî van taxên kurdan, êrîşa li dijî pergala Modernîteya Demokratîk bû. Dibe ku di pratîkê de êrişkar çeteyên hikumeta demkî Emşat û Hemzat bin. Lê ferman bi destê DYA, Îsraîl û Fransayê bû. Ev komên çeteyan cureyekî din ên DAIŞ'ê ne. Tenê navê wan hatiye guhertin, lê feraset û hişmendiya van komên çeteyan ji DAIŞ'ê ne cudatir e."



Mehmet Alî Ertaş



Emîne Kaya

**'Sûcên şer û li dijî mirovahiyê li taxên Kurdan pêk hatin'**

Mehmet Alî Ertaş tekez kir ku çeteyên hikumeta demkî da ku êrişên xwe rewa bikin, hincetan didin avakirin û wiha anî ziman: "Ev çeteyên êrîşkar ji bo êrîş bikin, hincetan ava dikin. Çawa ku di êrişên Şengal û Mexmûrê de, HPG û PKK nîşan didan, li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê jî QSD'ê hincet nîşan didan. Li Şengalê jî gelê Êzdî xwe diparêze, li van taxan jî gelê taxê û hêza navxweyî xwe diparastin. Ev jî mafekî wan ê herî rewa û pêwîst e. Lê armanca êrişkara valakirina taxan ji şêneyên resen û dagirkirina wê ye, da ku çeteyên xwe li wir bi cih bikin û kiryarên xwe yên herî qirêj pêk bînin û pêk anîn jî. Ji ber ku van hêzên navdewletî li ser axa Sûrî plan û proje çêkirine, ji bo van projeyan têxin meriyetê, li ser van taxan planan dagirkirinê kirin. Ev jî li gorî plana Îsraîl û hikumeta demkî ku divê ev taxên kurdan bêne valakirin. Ev jî sûcê şer û sûcekî li dijî mirovahiyê ne."

**'Gelê Kurd li çar aliyê Kurdistanê xwedî yek ruh û yek felsefe ye'**

Mehmet Alî Ertaş axaftina xwe wiha qedand: "Divê hemû gelê Kurd li çar aliyê Kurdistanê û cîhanê li dijî van êrişan dengê xwe bilind bike. Gelê Kurd li Bakur, êrişên li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê kêlî bi kêlî dişopîne û pir bi hêrs e. Ji xwe di 7'ê çile de jî li gelek bajarên Bakur çalakiyên girseyî hatin lidarxistin. Bi deh hezaran mirov tevî berfa zêde û sermaya zêde kom bûn û meşên girseyî li dar xistin. Gelê Bakur amade ye ku bi her awayî piştgiriyê bide şêniyên van taxan. Çawa ku li Kobanê xwedî derket, amade ye ku li van taxan jî xwedî derkevin. Ji ber ku êdî gelê Kurd li çar aliyê Kurdistanê xwedî yek ruh û yek felsefe ye. Gelê Bakur êrişa li dijî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê li dijî xwe dibîne. Êrişa li dijî Şengal, Mexmûrê, Efrinê, Îlam û Mahabadê li dijî xwe dibîne. Van êrişan qebûl nake."

**'Êrişa li ser Rojava, êrişa li ser Kurdên çar parçeyên Kurdistanê ye'**

Emîne Kaya diyar kir ku ji bo berxwedana Şêxmeqsûd û Eşrefiyê meşek girseyî li bajarê Amedê yê Bakurê Kurdistanê hat lidarxistin û wiha got: "Ji bo xwedîderketina li Rojava, bi taybet li berxwedana taxên Kurdan ên li Helebê, gelê Kurd li Bakur bi çalakiyan rabûn û xwedîderketina li hev a li hemberî van komkujiyên ku li her du taxan pêk hat, nîşan dan. Mîna di dema êrişa li ser Kobanê ku gelê Kurd li her bajarê Kurd û metrepolê Tirk rabûn û nerazîbûna xwe nîşan dan. Ji ber êrişa li ser Rojava, êrişa li ser Kurdên parçeyên Kurdistanê ye. Lewra gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê van êrişan li ser xwe jî dibînin, ji bo wê li Meclisa Tirkiyê DEM Partî çalakî kir û bertekên xwe nîşan da, tevî ku DEM Partî ne tenê partiya gelê Kurd e, lê hemû kesên demokrat li Tirkiyê di hundirê wê partiyê de cih digirin."

**'Bawerî tenê ya hêza Kurd e'**

Emîne Kaya axaftina xwe wiha qedand: "Li Sûriyê êriş ne tenê li ser Kurdan e, lê li ser hemû pêkhateyan e. Ev êrişên van çeteyan jî bê alîkariya Tirkiyê nikarin werin kirin, gelê Kurd vê baş dizane, cîhan jî vê baş dizane. Lewra gelê Kurd dizane ku hêza wê nebe, tu tiştî ji dewletê nikarin bidin seknadin. Ji bo wê bawerî tenê ya hêza Kurd e. Kurd mecbûr in ku li ber xwe bidin, ji ber heger li ber xwe nedin, wê di komkujiyan re derbas bibin."



# ‘Ew guhertinê li ser hesabê xwîna gelê Kurd pêktînin’

Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê Ezher Ehmed destnîşan kir ku guhertina ku li Rojhilata Navîn û Sûriyê çêdibe li ser hesabê Kurdan e û got, “Dewleta Tirk sûdê ji tevlîheviya li Sûriyê dibîne. Divê gelê Kurd li her derê zextekê li aliyên xwedî biryara siyasî bikin."

**Hemza Sêvo/ Hesekê**



Geşedanên ku li Rojhilata Navîn û Sûriyê rû didin, di qonaxa heyî de rojeva herî sereke ye, doza Kurdî û Kurdistanê, li hember jî qirkirina ku li ser gelê Kurd tê meşandin li pêşiya hemû cîhanê tê kirin. Nemaze kiryarên hovane li ser Şêxmeq û Eşrefiyê. Derbarê heman mijarê Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê Ezher Ehmed bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Di dema heyî de çi siyaset li ser Sûriyê û bi taybet li ser gelê Kurd tê meşandin?**

15 sal li ser kirîza Sûriyê re derbas bûn, piştî vê evqas sal û destpêkirina Buhara Erebî ya Rojhilata Navîn re, di dema heyî de tekez bû ku kirîza Sûriyê jî beşek ji projeyên cîhanî bû û guhertineke ku divê pêkwere. Di van guhertinan de qedera me gelê Kurd bû ku bibin beşek ji pilanên hêzên hegemon ên herêmî û navdewletî, hem jî Kurd bedelê bidin. Di nava qeyran û kirîza Sûriyê de, êrişên DAIŞ, HTŞ, rêjîma Baas, dewleta Tirk û komên çete yên girêdayî wê li ser Kurdan, gelê Kurd xeta sêyemîn hilbijart, Rêveberiya Xweser ava kir. Ev proje jî dikarîbû bibe projeya li ser ramana jiyaneke hevbeş û demokratîk, herwiha civak parastin xwe bike, xwe bi rê ve bibe û parastina nirxê xwe bike. Gelê Kurd di warê siyasî, leşkerî, aborî, civakî de gav avêtin û di hemû hêlan de destkeftiyên Şoreşa Rojava bi hevkariya hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dest xistin. Em dibînin ku siyaseteke bi vî rengî tê meşandin li ser herêmê û Sûriyê, bi taybet gelê Kurd, êriş û qirkirin li ser gelê Sûriyê tên pêkanîn, di encamê de parçebûn di çarçoveya nexşerêya Rojhilata Navîn de çêdibe, gelê Kurd jî rastî guhertineke demografî tê. Kurd neteweke resen in ku bi dirêjahiya hezarên salan li ser vê xakê dijîn, hin dewletên herêmî xwedî pilan in ku gelê Kurd bê statû û proje bimînin, nemaze dewleta Tirk e ku xewin û xeyalên wê pêkwere, komkujî û guhertina demografî pêkbîne û Kurdan bê proje bihêle. Ji ber vê yekê jî me dît ku çawa êriş li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê çêbû.

**-Ev hefteyeke ku êrişên dijwar û tundrew li ser Şêxmeqsûd, Eşrefî û Dêrhafirê tên pêkanîn, gelo aliyên li pişt vê tevlîhevî, şer û xwînrijînê çi sûdê werdigirin?**

Dewleta Tirk bi dirêjahiya kirîza Sûriyê ya ku herî zêde destwerdan di Sûriyê de kir. Wê gelek tevlîhevî çêkir, hem jî kuştin û kiryarên herî xerab bi gelên Sûriyê pêkanî. Bi hezaran belge hene ku her pirsgirêkeke ku derdikeve, destê MÎT a dagirkeriya Tirk tê de heye. Êdî, lêkolîner, rewşenbîr, dezgehên navnetewî û her kes vê yekê nas dike ku dewleta Tirk sûdê ji pirsgirêkan werdigire. Di herêmê de 2 proje hebûn, yek kevana Şyî bû ya din jî kevana Sunî bû, kevana Şyî bi serweriya Îran û baskên wê bû, ew bi biryareke navdewletî hate hilweşandin. Kevana Sunî jî bi serpereştiya dewleta Tirk bû, niha jî ew bi destê hikumeta demkî planên xwe dimeşîne, xeteke din a Soviyêt, NATO û WARSO hebû, keoalisyonê xwest Rûsyayê bêbandor bike. Di nava van pilanan de Sûriyê bû qada hesaban û gelê Kurd jî berdêlên giran dan. Ev zêdeyî heftiyekê hikumeta demkî û komên çete yên radîkal êrişî gelê Kurd li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê kirin, di heman demê de êrişî Dêrhafirê dikin. Li her du taxan êrişeke hovane hat kirin, li hemberî wê jî berxwedaniyeke lehengî hate raberkirin. Her dîmenek ku derdiket destanek ji berxwedaniya gelên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bû. Li wan her du taxan kiryarên serjêkirinê, revandin, komkujî, avêtina laşên şehîdan li ser avahiyan heman kiryarên ku DAIŞ’ê bi kar tanî, lê bi hovîtiyeke mezintir, bi çekên nûtir û di bin sîwana dewleta Sûryê de ev pêkdihat. Ev hemû sûnc bi fermana MÎT a Tirkiyê pêkhatin û ev yek armanca dewleta Tirk e. Hîna jî êriş berdewam in, dixwazin sîstema Rêveberiya Xweser tune bikin û projeyên Kurdan têkbibin.

**-Da ku Şoreşa Rojava tacîdar bibe, gelê Kurd ji komkujiyan were parastin pêwîst e gav bên avêtin û erka ku ji hemû aliyên Kurdistanî di vî warî de tê xwestin çi ne?**

Li hemberî van êriş, komkujî û qirkirinê li ser gelê Kurd, bêdengiya saziyên mafên mirovan, hêzên hegemon, Hêzên Keoalisyonê, , dewletên herêmî û navdewlet, pêwîst e berteka gelê Kurd çi bike û çi bangewaziyê bike gelo? Divê her Kurdek, li ku be, li kîjan welat û parçeyên Kurdistanê be, xwedî rêflêks û helest be. Gelê Kurd ji aliyê siyaset û helwestên xwe ve xwedî kêmasî ne, ne tenê bi gotinan helwest bên dayîn, lê belê bi awayekî piratîkî pêkwerin. Divê gelê Kurd zextekê bikin li ser hemû dewletên ku xwedî rol in di warê guhertina nexşerêyên cîhanî de. Bi taybet divê zext li Hêzên Keoalisyonê û Birîtaniyayê were kirin, ji ber ku ew xwediyên projeya Saykis-Pikot bûn, van hêzan ji bo berjewendiyên xwe û yên Israîlê, guhertin li ser hisabê xwîna gelê Kurd çêkirin. Kurdên li Israîlê û hemû cîhanê! Gelo hûn çi dikin di dema heyî de? Kanî 50 milyon Kurd li hemberî kiryarên xerab ku li ser ragihandina cîhanî tê eşkerekirin. Çi were kirin jî têrê nake, lê divê helwesta Kurdî were xuyakirin, pêwîst e Kurd di van rojan de li ser piyan bin. Dîrokek tê nivîsandin, derfet ji bo gelê Kurd heye ku siberoja xwe ji destpêkê ve binivîsînin. Divê her Kurdek bi saziyên navdewletî yên xwedî cihê biryarê peywendîdar bin, hem jî zextekê bikin li ser cihên ku biryara siyasî derdikeve, bi taybet ew odeyên reş ên ku biryarên kiryarên qirêj ji wir derdikevin û li ser Rojhilata Navîn û tevahiya Kurdistanê pêktên. Qedera her çar parçeyên Kurdistanê yek e, bila tu kes nebêje Rojava, Rojhilat, Başûr û Bakur ne di xeterê de ye. Bi êrişên li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, hem jî tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ew ne tenê êrişên li ser QSD’ê û PKK’ê ne, lê belê li ser gelê Kurd û tevahiya Kurdistanê ne.

## Êrişa Şêxmeqsûd komploya navdewletî ye!



**Dilyar Cizîrî**

Di roja 6’ê Çile de li Parîsê û bi navbênkariya Amerîka nûnerên hikumeta HTŞ’ê bi nûnerên Îsraîlê re civiyan. Hikumeta çete ya HTŞ’ê bi fermana dewleta Tirk hemû daxwazên Îsraîlê yên derbarê herêma ewle li Başûrê Sûriyê erê kir. Hin xalên civîna Parîsê di ragihanên de bûn rojev, lê hûrgilî û detayên civînê yên veşartî pir in. Lê tê gotin civîn tam li gorî dilê Îsraîlê bi rê ve çûye.
Îcar balkêş bû piştî civîna behsa mijarê bi çend saetan li dijî Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê êriş pêk hat. Di êrişê de dewleta Tirk, çeteyên girêdayî wê û bihezaran bermahiyên DAIŞ’ê yên xwe di bin navê Artêşa Sûriyê de fermî nîşan didin, cih girtin. Li gorî raporên hin saziyên fermî zêdeyî 42 hezar çete, zêdeyî 100 tangên Tirkiyê, bi dehan balafirên bê mirov ên SÎHA û Akincî, hemû çûreyên çekê giran di êrişê de hatin bikaranîn.
Lê tişta bala mirov dikşîne beriya çima beriya êrişa li dijî Şêxmeqsûd şandeya danûstendinan a QSD’ê û Rêveberiya Xweser bi navbênkariya Amerîka li Şamê bi rayedarên hikumeta HTŞ’ê re hevdîtin dikirin. Ev jî beşekî planê bû. Aliyên garantor bi vê yekê xwest xwe ji berpirisyariya cihgirtina di êrişan de dûr bixe. Ev jî diyar dike destê gelek aliyan di vê komployê de heye.
Îcar bawer bikin, heger şervanên Fermandar Şehîd Ziyad li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ber xwe nedana wê li Şêxmeqsûd wekî Perava Sûriyê li dijî sivîlan komkujiyên mezin pêk anîbana. Ji ber aramnceke wan heye, mijarekê bixin rojevê ser teslîmkariya hikumeta HTŞ’ê ji Îsraîlê re binixumînin.
Ji ber wê jî berxwedana Asayîşa Helebê û fedekariya fermandar Şehîd Ziyad û Şehîd Deniz rê li ber komkujiyên hîn mestir li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê girtin. Dibe hin bêjin ma komkujî, hovîtî û talan pêk hatiye. Rast e, lê heger Şehîd Ziyad biryara vekişîna zû daba, wê komkujî li dijî sivîlan gelekî mezin bibaya. Ji ber li gorî plana wan divê bûyer mezin bê nîşandan da itîfaqa HTŞ’ê û Îsraîlê ji rojevê derbixin. Me dît çawa bi serkêşiya Îstixbarata Tirkiyê hêzeke mezin a ragihandina dewletên ereb, di serî de Qeter û Erebistana Siûdiyê, li kêleka ragihandina Tirkiyê û ya hikumeta HTŞ’ê li derdora Şêxmeqsûd bi cih kirin û bi planeke qirêj êrişa li dijî Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dikirin rojev.
Ji lewma divê em bizanin êrişa li dijî Şêxmeqsûd û Eşrefiyê komployeke mezin a li dijî gelê Kurd û sîstema demokratîk a Rêveberiya Xweser e. Mirov tenê dikare navê komploya navdewletî ya li dijî Şêxmeqsûd û Eşrefiyê lê bike. Ev komplo bi gefên li ser Dêr Hafirê û hewldana derxistina fitneya Kurd-Ereb hîn bi hemû hêza xwe berdewam e.
Esasê kompliyê jî dewleta Tirk di çarçoveya siyasetên xwe yên qirkirina gelê Kurd de pêk tîne, niha jî dixwaze şerê Şêxmeqsûd wekî nakokiya Kurd-Ereb nîşan bide. Xwe jî wekî dûrî berpirsyariyê ye, nîşan bide. Tişta herî metirsîdar jî dixwazin derbeyê li Rêvberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya li ser esasê yekîtiya gelan bi rêve diçe bixîne. Wiha jî zemîna êrişên din li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rê ve bibin.

# Basên radestkirinê ku li Xûtayê hatin bikaranîn, ne layiqî berxwedaniya Kurdan e



**Reşo Mihemed**

Di sala 2018’an de li ser Xûtaya rojhilat a Şamê dorpêç û êrişeke mezin a rêjîma Baas hebû, gel birçî bû û çeteyên ku îro li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê kiriyaran dikin, li Xûtayê bi cih bûbûn. Di wê demê de kiryarên herî xirab ji hêla rêjîma Baas ve li ser gelên Xûtayê dihate pêkanîn. Gel dibû qurban ji kiryarên rêjîma Baas û çeteyên hikumeta demkî ya îro. Ev rewş ji destpêkirina kirîza Sûriyê dihate dîtin. Dorpêç, kuştin, tîkirin, berçîbûn û hemû cureyên binpêkirina hebûn li wê derê. Ev yek wiha domand heya ku sefqeyek di navbera alîgira rêjîma Baas (Rûsya) û dewleta Tirk çêbû. Bazarek li ser gelên Sûriyê hate kirin. Lihevkirinek di navber rêjîma têkçûyî, Rûsya û dewleta Tirk a dagirker de çêbû. Xûtaya rojhilat a Şamê ji hêla Tirkiyê ve hate firotin da ku Idlibê û Efrînê ji Rûsiyê hate kirîn, belê bazar hate kirin, kirîn û firotin li ser hesabê xwîna gelên Sûriyê pêkhat. Di encama vê peymanê de HTŞ’ê û çeteyên wê ji hemû Sûriyê hate komkirin, çûn Idlibê da ku ji hêla dewleta Tirk ve werin perwerdekirin. Dagirkeriya Tirk ew bi kar anîn da ku Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî, Minbic, Tilrifeet dagir bikin. Piştî rûxandina Baas bi salekê û hatin desthilata demkî, dagirkeriya Tirk, çeteyên girêdayî wê û hikumeta HTŞ’ê êrişên xwe li ser deverên wekî Eşrefî, Şêxmeqsûd û Dêrhafirê ranewestandine. Li Helebê her du taxên Kurdan Şêxmeqsûd û Eşrefiyê lê ku gelê Kurd dijî, destaneke berxwedanê hat nivîsîn, ev berxwedanî jî di rûpelên dîrokê de hat bicihkirin. Biryara wan ne hilbijartinek demkî bû, lê peymaneke rûmetê bû. Wan digotin yan serkeftin yan mirin. Li gel komên çekdar ên bi tank, topan, diron, firokên bêmirov û hwd… hebûn, tevî ku bi deh hezaran tundrew piştgiriya eşkere ji dewleta Tirkiyê û hikumeta HTŞ’ê werdigirtin. Di heman demê de şerê pîskolojîk dimeşandin li ser xelkê van her du taxan. Xelkên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi piştgiriya Hêzên Ewlekariya Hundirîn (Asayîş) bi biryardariya xwe ya bênavber bi bahozeke mezin re rû bi rû man. Ne tenê şerê taxan bû, ew şerekî ji bo nasnameya neteweyî bû, şerekî ji bo xwerêvebirinê bû, şerekî ku Sûriyek nû ava bike. Serkeftina li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, tevî xesaretê dê bibe keleheke bilind ku îradeya şervanên berxwedanê ji artêşan xurtir e û xwîna ku li vir tovê azadî hat rijandin, hem jî edalet û pirrengiyê bû ji bo Sûriya siberojê bû. Ew ne tenê ji bo parastina axê, lê ji bo parastina rûmetê, maf, xewna tevahiya nifşan ku di kêliyên efsûnî de destpêka rêya ber bi welatekî ku nayê kirîn û firotin, şerê hebûn û nebûnê dikirin. Gelo piştî 14 salan ji vê berxwedana lehengî ya gelên herdu taxan wê li otombîl û basên spî siwar bibin û ji taxên xwe derkevin? Basên spî nîşana xweradestkirinê ne, tu cudahî di navbera van basan û basên rêjîma Baas de tunene, basên ku çeteyên HTŞ’ê û gelên Xûtaya rojhilata ji wir ber bi Idilibê ve birin. HTŞ’ê û hemû çeteyên girêdayî dewleta Tirk di wê demê de di encama bazareke navdewletî de li basên (Kesk) ku nîşana icbarkirinê ne, siwar bûn û rêjîmê ew bêçek birin Idlibê. Gelo layîqî berxwedaniya gelên Şêxmeqsûd. Eşrefî û Hêzên Ewlekariya Hundirîn a her du taxan e ku li basên teslîmiyetê siwar bibin. Ji vî gelê wiha re şehadet û rêya karwanên şehîdan bi rûmettir e ku bidin li ser rêya kuştina li ser destên gemar ên çeteyan. Dema ku bas bi rêketin da ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Şêxmeqsûd lê siwar bibin, hêzên ewlekariyê ew bas kirin armanca guleyên rûmetdariyê. Piştî wê lehengên Hêzên Ewlekariyê destana xwe ya efsûnî domandin heya dawiya jiyana xwe.



# Sed birîndar û du Şehîd li Bakur Rojhilatê Sûriyê hatin pêşwazîkirin

Hevseroka Heyva Sor A Kurd Hediya Ebdullah da zanîn ku di nava hovîtiya êrişan de tîmên wan yên li her du taxan li ser erkên xwe bûn û got: “Hewildanên alîkariya tenduristiyê hatin redkirin, lê bi hatina birîndaran û Şehîdan re em li benda pêşwazî û pêşkêşkirina alîkariyê bûn. Nêzî sed birîndar û du şehîdan derbas bûn.”

**Zana Roj/Qamişlo**

Ji ber van êrişên hovane yên hikumeta demkî ya Sûriyê li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê gelek kes hatin kuştin, revandin, serjêkirin û birîdarkirin. Ji ber vê yekê Heyva Sor a Kurd li Bakur û rojhilatê Sûriyê biryar da ku destek û alîkariyên mirovî bide kesên birîndar li wan her du taxan û derbasî Helebê bibe. Lê belê ji ber destekdayîna birîndarên taxên Şexmeqsûd û Eşrefiyê di 9’ê çileyê de Heyva Sor A Kurd bi rêket, di destpêkê de ji alyê hikumeta demkî ya Sûriyê ve hatin redkirin û rê nedan ku derbasî her du taxan bibin. Herwiha di 11’ê çile de biryara derxistina sivîl û birîndaran re ber bi Herêmên Rêveberiya Xweser hatine dayîn. Di derbarê rewşa birîndaran, kar û xebatê ku hatiye kirin Hevseroka Heyva Sor A Kurd Hediya Ebdullah ji Rojanemeya me re axivî.

**Hovîtiya êrişan û windakirina derfetên dermankirinê**

Hediya Ebdulah anî ziman ku rewşa ku li her du taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hate jiyankirin li dijî mirovahiyê bû û wiha got: “Hewldanên me weke heyva Sor Heyva Sor A Kurd hebûn û li wan her du taxan du xalên tenduristiyê yên Heyva Sor A Kurd hebûn. Herwiha ev her du xalên tenduristiyê 24 seatan dibin xizmeta gel de bûn. Di vî şerê dijwar de li wan her du taxan jî tîmên me yên ambulansê ruxmî ewqas zehmetiyan bi erkê xwe rabûn û birîdar radikirin nexweşxaneyanan. Ji ber hovîtiya êrişan û nebûna derfetan nexweşxaneya Xalid Fecir ya tekane li taxê derfeta derman peydakirin û dermankirina birêndaran bi demê re winda kir. Me ji roja yekemîn ji êrişan de hemahengî bi Heva Sor A Sûriyê re û Xaça Sor a Navnetewî re jî kir, lê heta niha tu bersiv ji aliyê wan ve nehate dayîn.”

**‘Ambulans hatin redkirin’**

Hediya di berdewamiya axaftina xwe de ev bilêv kir: “Bi giranbûna şer re û bi windakirina pêşkêşkirina alîkariya mirovî û tendurisî li Helebê, me li vir biryar da ku em 15 Ambulansên Heyva Sor A Kurd derbasî her tu taxan bikin. hemû ambulans ji her alî ve hatin amadekirin û ber bi Dêr Hafir ve çûn. Lê belê ev alîkariya mirovî ji aliyê hikumeta Demkî ve 15 Ambulansên Heyva Sor A Kurd hatin redkirin. Mixabin ji ber wê yekê me nikarî bi nexweşxane û hevalên wê derê re bibin alîkar.”
Hediya da zanîn ku di 11’ê Çile de birîndar û Şehîd gihîştin Dêr Hafirê û ew li bendê bûn û got: “Hevya Sor A Kurd di 11’ê çile de li benda Şehîd û birîndarên ku ji her du taxan derketine bû. Nêzî sed birîndarî û du şehîd ji wan her du taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê anînî. Herwiha birîndar li nexweşxaneyên Reqa, Tebqa û Hesekê hatin belavkirin. Rewşa wan tê şopandin û bi hemû derfet û alîkariyan em û nexweşxaneyan bi hev re dibin alîkar.”
Hevseroka Heyva Sor A Kurd Hediya Ebdulah axaftina xwe wiha bi



dawî kir: “Banga me ew ku Xaca Sor a Navnetewî û hemû rêxistinên tenduristî yên navnetwî bi erkê xwe rabin û bêdeng nebînin. Pêwîst e weke her car li hember sûcên şer yên ku tên kirin bê deng nemînin. Herwiha destekê bidin Heyva Sor A Kurd, ji ber ku di vê demê de barê herî giran li ser milê Hevya Sor A Kurd e.”
Hêjayî gotinê ye ku sê endamên Heyva Sor A Kurd li Helebê hatin girtin û navê wan wiha ne: Yûsif Henan Hamoko - Ajokarê Ambûlansê Ebdulrehman Ebdo - Hemşîre Ramî Hisên El-Elî - Berpisyarê Tîma Bijîşkî

# ‘Ez ê heta dawiyê belgeyên dîrokî yên bajarê Dêrikê biparêzim’

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Fatima Ebdulxenî diyar kir bi salan e belgeyên dîrokî yên girêdayî plansaziya destpêkê ya avakirina bajarê Dêrikê di destê wê de têne parastin û wiha got: “Heya dawiya temenê xwe ez ê van belgeyên dîrokî biparêzim û dev ji vê mîrasê bernadim.”**



Fatima Ebdulxenî keça Hecî Ebdurehman Ebdulxenî ye ku yek ji damezrînerê bajarê Dêrikê ye, Fatima li bajarê Dêrikê ji dayîk bûye temenê wê zêdeyî 80’î salî ye, ji zarokatiyê ve heya niha dev ji mala xwe bernedaya û wê wek mîrasekî ji keda bavê xwe dibîne, dema zarok bû dihat bîra wê çawa dergehê mala wan ji her kesî re vekirî bû û destek didan her kesî, di heman demê de ew zarok bû bavê wê behsa dîroka siyasî ya Sûriyê jê re dikir. Li gorî Fatma dibêje wê zarokatiyeke gelekî xweş derbas kir ji ber ku gelê bajarê Dêrikê wek malbatekî bi hev re jiyan dikirin bêyî ku ferq û cûdahî bi ruhê evîn û aştiyê bi hev re dijiyan.
Di derbarê jiyan û belgeyên dîrokî yên plana destpêkê ya bajarê Dêrikê Fatima Ebdulxenî keça Hecî Ebdurehman Ebdulxenî ye ku yek ji damezrînerê bajarê Dêrikê ye, ji Rojnameya me re axivî.

**Belgeyên Dîrokî yên bajarê Dêrikê**

Fatima Ebdulxenî da zanîn ku belgeyên dîrokî di arşîfên dîrokî yên bajarê Dêrikê de diparêzin û wiha got: “Dema ku em van belgeyên kevin lêkolîn dikin, em dibînin ku ew plana yekem a belgekirî ya bajêr temsîl dike, ev yek dibe isbateke dîrokî ya pêşketina Dêrikê ji wê demê ve. Ev plan di sala 1949’an de hatiye çêkirin û bi baldarî hatiye belgekirin, topografiya Dêrikê di wê demê de nîşan dide, di nav de Çemê Dêrikê, ku di navenda bajêr re derbas dibû û baxçeyê leşkerî yê Fransî ku wê demê yek ji nîşaneyên wê yên berbiçav bû. Ev nexşe belgeyek fermî ye ku ji hêla dewleta Sûriyeyê ve hatibû derxistin, bi mohra Komara Sûriyeyê hatiye mohrkirin, bi vî rengî girîngiya wê ya dîrokî wekî çavkaniyek ku nîşaneyên bajêr di wê demê de belge dike zêde dike.”

**‘Bajarê Dêrikê bi pirrengiya çandî tê naskirin’**

Fatima Ebdulxenî axaftinên xwe berdewam kirin û wiha got: “Li Dêrikê, têkiliya di navbera niştecihên wê yên Kurd, Ereb, Suryanî, Kildanî û Ermenî de xurt bû, bi têgihîştin, biratî û jiyana hevbeş dihat naskirin, ku ev yek yekîtiya civakî û pirrengiya çandî dida xuyanî kirin. Bi temsîlkirina têkiliya bi eşîrên Ereb re, di nav de eşîra Şemera, Şêx Hemîdî Deham El-Hadî El-Cerba, serokê rehmetî yê eşîra Şemer, roleke pir girîng di avakirina evîn, aştî û biratiyê di navbera gelê Rojava de lîst. Kurê wî, Şêx Maneh Hemîdî Deham El-Hadî El-Cerba, li ser vê rêyê berdewam kir da ku Rojava bimîne sembol û mînakeka jiyana hevbeş.”

**Parastina belgeyên dîrokî**

Fatima Ebdulxenî dawî li axaftinên xwe anî û wiha got: “Heya dawiya temenê xwe ez ê van belgeyên dîrokî biparêzim û dev ji vê mîrasê bernadim, pêwîste her yek ji me xwedî li axa xwe derkeve û derfetê nede dijmin ku dest bavêje çand û mîrasên me. Ez hêvî dikim ku dengê gelê kurd li Sûriyeyê bibe yek û li dora yek maseyê bicivin ku xizmeta doza Kurd bikin.”

## Bîra Civakê

## Di civaka şareza de, polîtîka



Ehmed Hesen

Polîtîka yek ji têgehên ku di serdema feylesof Arîsto 322-384bz de derketiye holê, ew têgeheke Yewnanî ye, di zimanê Yewnanî de weke têgeh bi rêvebirina bajêr tê pênasekirin, di zimanê erebî de jî siyaset tê gotin, tê wateya kedîkirina hespan, di zimanê kurdî de jî weke ramyarî, siyaset herî zêde cih digire. Mirov dikare ji danasîna têgeha polîtîka zêdetir cewherê vê têgînê derxe pêş û formulîze bike, di civakên şareza û dewletdariyê de polîtîka ji rastiya civakî hatiye qutkirin û weke karekî taybet ê hêzên dewletdar tê hesibandin, di heman demê de civakên polîtîk weke hebûnên herî terorane yên dijberî sîstema hegemondar tên dîtin û li ber wan jî tedbîrên giran û ceza tên sepandin, li vir ez behsa polîtîkaya civakî dikim, ji ber ku dewlet jî bi polîtîkayê hebûna xwe dinepixîne, ya rast ew ne polîtîka ye, tûndiya nijadperestiyê ye. Yek ji rêgezên bingehîn ên polîtîkayê bicîhanîna pêwîstiyên civakê yên jiyana azad û bi rûmet e, di heman çarçoveyê de polîtîka sererastkirina şaşîtîyên dîrokî yên civakê bingeh digire, çendîn exlaqê civakî û polîtîka bibin yek, ewqas jî rê li ber girtina pirsgirêkên civakî tên girtin. A rast hêzên dewletdar bi pêşengtiya modernîteya kapîtalîst bi qasî ku rê li ber hilweşandina civakan vekirine, ewqas jî rê li ber naskirina polîtîkayê xetimandine, naskirina polîtîka çareseriya pirsgirêkên civakî di nava xwe de dihewîne, polîtîka saziya sereke ya civakê ye, da ku ev sazî nebe bingeheke qayîm a çavkaniya çareseriyê, bi hemû rêbazan rê li ber naskirina wê hatiye girtin, li rojhilata navîn qeyranên ku rûdidin, ji pilaneke polîtîk wêdetir tewşîtiyeke mezin a dewleta netewe ye, mirov nikare rewşa heyî bi polîtîkayê bide pênasekirin, a rast qeyrana heyî encama windabûna qabîliyeta exlaqî û polîtîk e. Bi qasî ku ferd ji qabîliyeta xwe ya polîtîk bireve, ewqas jî dikeve qefesa dekûdolabên dewleta netewe. Vaye li Sûriye rewşeke wiha tê jîyîn, piştî 14 salên rewşa kawos, serhildan û şerê bêserûber, sîstem veguherî şêweyeke radîkal a îslamperestiyê û rê li ber tesfiyekirina şoreşgerên rastîn vekir, çi kesên ku duh li qadên navdewletî pere di berdêla girtina wan de dihatin pêşandan, îro di serwerîya Şamê de behsa avakirina dewletê dikin, di bingeha vê rastiyê de şoreşa ku polîtîk û exlaqê civakî ji dest dayî heye, li ser hesabê gelê Sûriyeyê yê ku banga xistina dîktatorîyê dikir, dîktetorekî nûjen ku bi Îslama siyasî cîlakirî xwe da pêş. Li cihê ku polîtîka berfireh dibe, hêzên dewletdar qels dibin û kêm dibin, di heman demê de bi qasî ku qefesa dewleta netewe fireh dibe, bêhin li polîtîkayê diçike. Li Rojavayê Kurdistan û bakur û rojhilatê Sûriye ev 14 sal in statuyeke polîtîk heye, em dikarin di sedsala 21an de nimûneya herî berbiçav a rêveberiya polîtîk di vê herêmê de bibînin, avakirina civakên exlaqî û polîtîk bi pêşengtiya felsefeya rêber Apo karîbû hemû gelan û pêkhateyan di bin sîwana netewa demokratîk de bicivîne û pirrengiya civakî biparêze, çaxa ku polîtîka û demokrasî di zikhev de bibin weke goşt û hestî, hingê mirov dikare behsa civakeke komînal, wekhev û azad bike, ji ber ku bihara ereban ev yek nekir armanca serhildanên xwe, bi têkçûn û mirinê re rû be rû man û welat dan ber rûxandinê, di heman demê de li şûna ku bibin xwedî projeyeke demokratîk, berovajî wê bê piroje man û di gavavêtinên xwe de xizmeteke mezin dan hêzên kapîtalîst. Xulase, avakirina civakeke azad hewcedarîya xwe ya mezin ku bikaribe rihê azadiyê bide wê, şêweyê rastîn ê polîtîkaya azad e, ango polîtîkaya xwe dispêre çanda civakê, dîroka civakê û cewherê wê di xwe de dihewîne.